



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdî Miqdad Mîthed Bedirxan

# Armanac

Hejmar, No:153

Çiriya Pêşîn  
October 1994

Buha - Price  
20 SKR, 4 DM

Rojnameya Mehane

Kongreya Duyem a YEKBÛNê:

## "Yekîtiya têkoşînî ya hêzên netewî û demokratîk pêş bixin"

□ "Kongreya duyem a YEKBÛNê pirsar partiya legal a Kurdî him ji aliyê aktuelbûn, him jî li gor perspektîfên berê yê partiye helsengand û gihişt wê baweriyê ku di vî warî de peydakirin û pêşxistina însiyatîfên aktîftir û bêtir encamder wezîfeyê girîng e"

□ "Kongreya duyem a YEKBÛNê li ser bûyerên li cihanê, li deverê û li Kurdistanê rawestiya; li ser naverok, encam û bi ebatên cihê tesîrên wan yê li ser têkoşîna me ya netewî û demokratîk helsengandin; ji bo perspektîfên têkoşîna netewî û demokratîk hin biryar girtin; pêşniyarên li ser guhertina destûr û programê munaqêşe kir û pejirand".

Kongreya duyem a Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê (YEKBÛN) di heftiya dawî ya Îlonê de li Kurdistanê çêbû. Di beyana daxuyaniya Komîteya Navendî de ku di meha Çiriya Pêşîn de ji raya giştî re hat belavkirin tete gotin ku, "Kongreya duyem a YEKBÛNê bi beşdariyê mezîna munaqêşe li ser rapora polîtîk a Komîteya Navendî kir û bi giştî li ser wezîfe û berpirsiyariyên li pêş tevgera netewî-demokratîk û bi taybetî jî wezîfe û berpirsiyariyên li ber YEKBÛNê helsengandin û qebûl kirin. Kongreya me wezîfe û perspektîfên polîtîk ên qonaxa nuh dest nîşan kirin û biryarên pêwîst girtin. Kongreyê kê-mûkasiyên di warê xebata partiye de xuya kirin, ji bo nehiştina wan biryara tedbîrên pêwîst girtin û diyar kir ku ji Kongreya Yekîtiyê û vir de xebatên girîng hatine kirin; û garantiya biserketîne, avahiya rêxistineke xurt, xwedî îstîqrar û berdewam û têkoşîn e."

Kongreya duyem a YEKBÛNê li ser bûyerên li cihanê, li deverê û li Kurdistanê rawestiya; li ser naverok, encam û bi ebatên cihê tesîrên wan yê li ser têkoşîna me ya netewî û demokratîk helsengandin; ji bo perspektîfên têkoşîna netewî û demokratîk hin biryar girtin. Kongreya duyem, li ser bingehê huwîyet û perspektîfa sosyalîst û bi armanca polîtîk; Kurdistanê serbixwe û demokratîk beşdariya xebata rizgariya netewî û civakî pêwîst dît. Di çareserîna pirsar Kurdistanê de jî Kon-



greya YEKBÛNê da diyar kirin ku "noqa bingehîn ew e ku gelê Kurd xwediyê wî mafî be ku bikaribe pêşeroja xwe bi azadî dest nîşan bike û ji bo bikaranîna vî mafî jî peydakirina şertan e." Bi baweriyê kongreyê, "Kurdistanê serbixwe û demokratîk ji bo çareserîna dawîn û demokratîk a pirsê, rasttirîn rê ye; lê di gel wê jî wekî ku ji berê de me diyar kiribû ji bo bidestxistina mafê herî biçûk ê netewî û demokratîk jî divê têkoşîneke bi biryar bê dayîn."

Kongreya duyem li ser navgînên têkoşînê û bi karîna wan de hesasbûn dest nîşan kir û pêwîst dît ku;

"gavên ku partiye di vî warî de pêwîst dîtine û hatine avêtin, di hemû waran de (legal, îlegal, biaştî, çekdarî û.w.d.) bîna pêş xistin û bibin dezgehên bihêz yê ku huwîyet û cografîyaya me bingeh digrin." Kongreya YEKBÛNê her wiha li ser pirsar partiya legal a Kurdî him ji aliyê aktuelbûn, him jî li gor perspektîfên berê yê partiye helsengand û gihişt wê baweriyê ku, "di vî warî de peydakirin û pêşxistina însiyatîfên aktîftir û bêtir encamder wezîfeyê girîng li pêşiya YEKBÛNê ye."

Dûmahik: r.11

S. Roşan

Netewe, xwezanîna netewî û rola zimanî

r.4


Îsmail Emo: "Li Sûriyeyê li hember milletê Kurd siyaseteke şovenî li dar e"

r. 6-7

## Dêrsim di bin postalan de

□ Li gor agahdariyan, hejmara leşkerên ku di operasyona Dêrsimê de beşdar bûne, 5000 e. Li gor agahdariyan di diroka modern a Tirkî de ev operasyonên herî mezîna in. Hejmara gundên ku bi temami hatine şewitandin 15 ne, 3000 kes bê xanî mane. Hin gund jî qismî, hin mal hatine şewitandin an jî hilweşandin. Operasyon li gundên sêmila navbera Nazimiye, Ovacik û Pertekê hin dom dike.

Li Kurdistanê ev du sal e, nêzîkî jî îsal bi awayekî sistematîk gund tîn valakirin. Gundiyên ku gundên xwe vala nekin, dewlet agir li xaniyê wan, zeviyên wan, li daristanên wan dixê. Di vî sala dawî de hejmara gundên ku hatine hilweşandin û şewitandin digihîje 1000'î, bi taybetî ya di van 10 salên şer de jî digihîje 2000'î. Şewitandin û wêrankirina hewqas gund û koçkirina sedhezaran însanan li Tirkîyê tu reaksiyon peyda nekir, masmedya Tirkîyê, "demokrat"ên Tirkîyê wek tu tişt tunebe guh û çavên xwe girtin. Lê duyê şewata gund û daristanên Dêrsimê çavên wan şewitand, bêyî ku bixwazin hinek qala rastiya ku îro li Kurdistanê tê jiyandin bikin.



Wezîrê Dewletê Azîmet Koyluoglu got; dewletê li der û dora Dêrsimê 15 gund şewitand û 3000 kes bê xanî hişt'

Ji roja 24'ê Îlonê vir ve ye Ordiya Tirk wek ku herêma Dêrsimê ji nuh ve dagîr bike, operasyonan dike. Ji bo vî operasyonê komandoyên bijarte ji Bolu û Kayseriyê anîbûn, leşkerekî giran xistibûn herêma. Operasyon, qetlîama 1938'an ya ku me di pirtûkan de xwendibû, li ber çavên me jîndar dikir. Vê bûyerê jî nîşanda ku dewleta Tirk di 56 salan de ji hovîtî û ji barbariya xwe tu tişt wunda nekiriye.

Li gor agahdariyan hejmara leşkerên ku di operasyona Dêrsimê de beşdar bûne 5000 e. Li gor agahdariyan ku parlamentere Dêrsimê Sinan Yerlikaya û Wezîrê Dewletê Azîmet Koyluoglu daye hejmara gundên ku bi temami hatine şewitandin 15 ne, 3000 kes bê xanî mane. Hin gund jî qismî hin mal hatine şewitandin an jî hilweşandin. Operasyon li gundên sêmila navbera Nazimiye, Ovacik û Pertekê hin dom dike.

Wezîrê Dewletê Azîmet Koyluoglu hem bi nivîskî û hem jî bi devkî beyan da, got: "Gunda,

dewlet dişewitîne", "Tuncelî (Dêrsim) bûye merkeza terorê. Lê herêma din bûyerên terorê PKK dike, lê terora li Dêrsimê terora dewletê ye". Serokê Meclîsê Husamettîn Cîndoruk jî ji gundiyên Dêrsimê ku çûbûn wî dibûn, gotiye "Ne mumkun e ku PKK gunda bişewitîne". Li dor 10 muxtarên gundên Hozatê çûn Ankarayê ji bo raya giştî ji bûyerê agahdar bikin. Wan di beyanên xwe de got terora vî dawiyê hemû dewlet kiriye.

Dewlet li hember van beyan û rastiyan şaş ma. Serokê Fermandarê Giştî İsmail Hakki Karadayi got: "Gundî ji bo alîkarî bistînen wan gundê xwe şewitandiyê". Wezîrê Hundurîn Nahît Menteşe darewekî hin "bi aqilî" kir, got, hin gundan PKK cilên eskera li xwe kiriye, gund şewitandine, hin gund jî di şerê navbera hêzên dewletê û PKK'ê de şewitîne. Lê gor malumatên xelk dide li wan gundan yekê jî şer demeketiye. □

## Bibîranîn

Di 29.10.1994'an de Hevkariya Hêzên Siyasî yê Kurd û Kurdistanî li Swêdê, li bajarê Stokholmê bi civînekê CEGERXWÎN, YILMAZ GUNAY, QENATÊ KURDO bi bir anî.

Di civîna bîranînê de li ser jiyana û xebata her sê rewşenbîrên Kurd hat rawestan. Keyo Cegerxwîn li ser jiyana Cegerxwîn, Rohat li ser jiyana û xebata Qenatê Kurdo û heval Teyfûr jî bi giştî li sê filmên Yilmaz Gunay "Kerî, Rê, Diwar" dîtînen xwe pêşkêş kirin. Helbestvan Ehmed Huseynî bi xwendina helbesteke xwe beşdarî civîna bû.



Rojeva Mehê

Mûrad Ciwan

### Cumhûriyeta Guran

29'ê Çiriya Pêşin, roja 71 saliya damezirandina Cumhûriyeta Tirkîyê bû. 71 sal berê, di 29'ê Çiriya Pêşin a 1923'an de li Tirkîyê seltenet (padîşahî) hatibû rakirin û rejimêkî cumhûrî hatibû ilankirin.

Li gorî televîzyon û radyoyên taybetî, pîrozbahîya 71 saliya cumhûriyetê îsal dê ji hemû salên çuyî cûdatir bihata lidarxistin. Cara pêşin, li Îstebolê pîrozbahî wê ne di bin monopola dewletê de, lê ji alî mueseşê û dezgeyên sivilî; bi alîkariya sermiyandarên xas, ji bal hunermend û ronakbîrên welêt ve bihata pîrozkirin. Televîzyonên taybetî ehemiyetêke mezin didan vê pîrozbahiyê. Cara pêşin di tarîxa Tirkîyê de pîrozbahî wê ne bi merasimên resmî yê dewletê, ne bi meş û mersên leşkerî, lê bi aheng û şahiyek gelêrî bihata pîrozkirin. Cara pêşin, bi bîr û baweriyeka musamehekarî, îhtîram û dilovanî hemî millet li dora cejnêka gelêrî dicivîya. Ev pîrozbahî wê bibûna nîşana aşî, biratî, wekhevî û bihev re jiyana hemû hemwelatîyan.

Tiştêkî balkêş bû. Gelo çi dibû? Gelo bi rastî jî li Tirkîyê hin tişt hatibûn guhertin? Gelo fikr û kultura rûmeta însanî li Tirkîyê rû dabû? Piştî ku televîzyonan diyarkirin ku wê vê pîrozbahiyê neqlen bidin, viyaneka xurt li cem min peyda bû ku ez xwe bidim hemberî televîzyonê û temaşa pîrozbahîyan bikim.

Gava seeta pîrozbahiyê hat min xwe da ber televîzyonê; "perde rabû û leystikê destpêkirina kamerayên televîzyonê berê xwe da "Meydana Taksîmê" ya Îstebolê: Li rexekî meydanê platformeka mezin ji bo amadekirinên pîrozbahiyê hatibû danîn û li meydanê boşahiyeka mezin ji însanan pêkhatibû. Di destên wan de yan alaya Tirkîyê yan jî rismên Mistefa Kemalî li ba dibûn. Ji bilî alayê û rismê Mistefa Kemalî çu ala, pankrat an rismekî din nebû. Di nîveka boşahiyê de, nêzî platformê bandoyên leşkerî û yê belediyê û li pey wan jî ref bi ref leşker rêz bûbûn. Li ser platformê, Waliyê Îstebolê, serokên belediyeyên Îstebolê û generalên Îstebolê di rêza pêşî de ciyên xwe girtibûn. Serokê Belediya Beyoglu'yê yê ku ji "Refah" ê bû li rexê çep yê wafî bû.

Pîrozbahiyê bi merşa milî ya Tirkîyê destpêkir. Bandoya leşkerî heta jê dihat "Îstiklal Marşı" yê lê dida: "Kahraman urkuma bir gül ne bu şiddet bu celal!" Piştî Wali Hayrî Kozakçioğlu dest bi axaftina rojê kir, zinge zinga dengê wî di meydana "Taksîmê" de olan dida; "Em li vir, lê vê meydanê sond dixwin, heta ev دنیا hebe, wê Tirkîyê Kemalîst û laîk bimîne. Çukes wê nikaribe welêt perçe bike". Bi axaftina wî re boşahiya meydanê diqîriya "Tirkîyê laîk e wê laîk bimîne", "Bimre PKK" Walî li boşahiyê vedigerand "Ew destê ku xwe dirêji yekîtiya welatê me, layîkîya cumhûriyeta me bike ew dest wê were jêkirin". Mesaja walî eşkere bû, berê xwe dabû Kurdan û piştî re jî dîndaran û ew tehdît dikirin: eşkere digot, kesê ku ne Tirk be, ne bêje ez Tirk im û ne Kemalîst û laîk be, di vî welaî de cih jê re nîne. Qet guh nedayê ku yê li rex wê serokê belediya Beyoglu'yê yê Refahê yê dîndar e û bawerîya wî ne bi Kemalîzmê ne jî bi laîkîyê têt. Qet guh nedidayê ku dengê wî di televîzyonan re diçe 15-20 milyon hemwelatîyên ku ne Tirk in. Bil'eks dixwest ew vê tehdîdê bibihîzin û li gorî wê gavên xwe bavêjin.

Boşahiya meydanê jî bi şîrên xwe ew tesdîq dikir. Di nav boşahiyê de alîgirên Turkes pêçikên destekî xwe wekî guhên guran miç dikirin û destê xwe li ba dikirin.

Piştî walî, dora hunermend û dengbêjan hat: spîkerî dabûn Cem Ozerê bav Tirk û dê Ermenî. Ozerê dê Ermenî wekî tecawuzî diya xwe bike diqîriya digot "Ne mutlu Turkum diyene!" Bi wê jî nedisekinî, lê zêde dikir: "Hikmetek mezin di vê peyva wecîza Atatürk de heye. Atatürk negotiye ku "Ne mutlu Turkklere". Lê gotiye "Ne mutlu Turkum diyene". Nexwe kî bêje ez Tirk im ew bextiyarî jî wî re ye". Cem Ozerî di pey axaftina xwe re stranbêjêk ji Rûmê Îstebolê bi navê Hayko derxist. Hayko derket hemberî boşahiyê, ala Tirkîyê di desta de, wekî filehê eşheda xwe bîne, were ser dîne Îslam qûriya got; "Ne mutlu Turkum diyene" û dest bi strana xwe kir. Îdî diyar bûbû ku pîrozbahîya 71 saliya Cumhûriyeta Tirkîyê li ser kîjan mînwale wê bimeşîya. Nexwe, ne dewletê lê hêzên sivil ên Tirkîyê jî bi bahaneke wilo xwestibûn xwe bidin diyarkirin ku ew cumhûriyeteka çawa dixwazin. Cumhûriyeta ku wan dixwest ew cumhûriyeta bû ku heta niha dewleta wan ew li piya xistibû. Yanî cumhûriyeta Tirkan û ya ku digotin em Tirk in. Derengiya şevê İbrahim Tatlısesê Kurd'esil jî hat gîhaşt ahangê wî ji îmana xwe teze kir, got: "Gava min di televîzyonê de dît ku ev aheng ahengek çawa ye, hema min biryara xwe da ku ez divê jî vê ahengê nemînim û bi lez û bez min xwe gîhand meydana Taksîmê".

Gava min ev pîrozbahî dît, di nav mij û dûmaneka himbir ra wela-tekî welê li ber çavên min xuya bû ku, gund û daristan û şax û baxên wê di nava agirêkî cehenemî de dişewitîn, tank û topên ordiyên destî û çiyayên wê bi guleyên xwe dikutan, li esmanê wê girregira teyarê û helîkopteran bû. Însanên wê tevî kal û piçûk û jin û mêrên xwe rêz bûbûn bi çolan ketibûn: gund û malên xwe yê wêrankirî di nav dûmana wan agirên cehenimî de li pey xwe hiştibûn, berê xwe dabûn asoyekî nenas, diçûn û diçûn.

Li wî welaî, keftarekî heftê salî bi navê "baba" xwe kiribû rîsîpiyê welêt û dîlegurêk bi navê seroka welêt derketibû serê çiyê, di nav wê mij û dûmana wêranker de dizûriya: "Dewlet malan wêran nake, gundan naşewitîne, heke ez bi çavên xwe jî bibînim ez bawer nakim ku eskeran gund şewitandine. Hebe nebe ev karê terorîstên cûdaxwaz e".

Dîlegur li serê çiyê dizûriya, nêregurên li dorê jî destekî xwe radikirin her du pêçikên wî wekî guhên guran li hewa miç dikirin. Cem Ozerê dêermenî, Haykoyê Rûmî û Îbo'yê Kurd jî diqîriyan: "Ne mutlu Turkum diyene"

Guran 71 saliya cumhûriyeta xwe pîroz dikirin.

## Rojnameyeke nû "REALÎTE"

Di rojên pêş me de li Tirkîyê rojnameyeke nû ya hefteyî wê dest bi jiyana xwe bike. Li gor xebera gihîştîye dest me, berdewamiya rojname Kurdistan Press ku di Îlona 1986'an de li Stockholmê derket û piştî hejmeta 1993'an hate rawestandî. Rojnameyeke din bi navê Realîte wê li Tirkîyê bi zimanê Tirkî û Kurdî derkeve.

Wek tê zanîn rojname Kurdistan Press di sala 1992'an de xwest jiyana xwe ya çapemeniyê li Tirkîyê bidomîne. Bi proja xwe alîkarî ji SIDA'yê xwest. SIDA ev proje di Çileyê Pêşin ya 1993'an de qebûl kir. Lê belê piştî qebûlkirina projê tu pere ji Kurdistan Pressê re nehate şandin. Di Adara 1993'an de berpirsyarên Kurdistan Pressê wexta careke din doz li SIDA kirin, SIDA bersiv da wan ku peymanî bi Kurdistan Pressê re êdî derbas nabe û li gor projê qismê alîkariyê yê ewilî bi şirketa navê Baksî Haus re bûye. Ji ber vê yekê jî K. Press rîya mahkemê digre.


Li gor ku xebera me dawiyê girtiye SIDA û avukatên Kurdistan Press li hev kirine û alîkariya lazim ji bona rojname derxistine li Stenbolê wê bête dayin.

Berpirsê rojname Realîte ku wê li Tirkîyê derkeve Orhan Kotan, dibêje ku Realîte, wê jî rojname din yê Kurda cûdatir, wê li dervayî xetên îdeolojîk, bi huviyeteke serbixwe be. Orhan Kotan

dibêje bi taybetî guher-tinên ku li seranserê cîhanên pêk hatine li Tirkîyê û Kurdistanê jî tesîr kirin lê qandî ku tê xwestin mesele baş nayê munaqesekirin, emê bixwazin giraniya xwe bidin vî aliyê meselê Çapemeniya Kurda di bin êrişên giran de ye û ew li hember PKK'yê yê li ser xwe oto sansur datîne û siyaseteke çapemeniyê ku yekalî dimeşînin dê Realîte di wî warî de, vê valayiyê tije bike.

O. Kotan dibêje ku li Ewropa çapemeniya Kurdî pir pêşde diçe û dewlemendtir dibe, lê mixabin ew çapemeniya bi zimanê Kurdî hema bêje qet nagihîje Tirkîyê. Ev nivîskarên ku bi Kurdî di rojnameyên Kurda de dinivîsinin amela wek zarokane ji dê dibînin di rojname de û dibê emê giraniya xwe bidin vî aliyê jî...

Tada ku îro li ser çapemeniya Kurdî heye wê jî bo Realîta jî her berdewam be. Lê Kotan dibêje ku li ser hemû tiştî jî divê ronakbîr û siyasetmedarên Kurda mecbûr bûn ku di bin her şertî de wan



Orhan Kotan ji helbestvanîyê ber bi rojnamevaniyê: "Li Ewropa çapemeniya Kurdî pir pêşde diçe û dewlemendtir dibe, lê mixabin ew çapemeniya bi zimanê Kurdî hema bêje qet nagihîje Tirkîyê"

zîfeyên dikevin ser milê wan bînin cî.

Cûdabûna Realîteyê jî rojnameyên din yê Kurdî wê ew be ku Realîte wê giraniya xwe bide ser munaqeseyên çareser kirina pîrsa Kurd di nav sinorên Tirkîyê de. Di nav wê çarçovê de slogana Realîte wê "Hîn bêtir demokrasî, hîn bêtir azadî û hîn bêtir rehetî"

## Parlamentêrên Kurd ji meclîsê avêtin Ji bo ciyên wan hilbijartinek derewîn

Di 4'ê Çileyê Paşin a 1994'an de li hin bajarên Kurdistanê bakur û Tirkîyê hilbijartinên qiamî çêdibin. Hilbijartinê kaşo "qanûnî" û "huqûqî" ye û jî bo 22 parlamentêrên Meclîsa Tirkîyê ku cihên wan "vala mabûn" çêdibin. Lê wekî ku tê zanîn 13 ji wan parlamentêrên DEP'ê bûn ku hukûmetê uminiteta wan a parlamentêrî rakir û 8 ji wan girtin; anku cihên wan yê li Meclîsê hatin valakirin.

Li gor qanûnên Tirkîyê, dema di parlamentoyê de 23 kursî vala bibin heger hilbijartinên giştî ne nêzik bin, heger hilbijartinên giştî ne nêzik be, divê di wextek kurt de hilbijartinên qismî çêbibin ku ew ciyên vala bînin dagirtin. Helbet di vê demê de biryardayina hilbijartinên qismî him jî bo dewleta Tirkîyê him jî bo partiya sereke ya li hukum e, DYP'ê li gor encamên hin hesabana e.

Dewleta Tirk bi avêtina parlamentêrên Kurd li Ewropa û li raya giştî ya dinê, kete rewşeke xerab. Deriyên rêxistinên navnetewî yek bi yek li rûyê Tirkîyê tîn girtin. Dewletê piştî li Kurdistanê pêlên

terorê gihandin hudûdê wehşetê, li dor 2000'an gund xera kirin, bajarokên tevgera netewî lê xurt e vala kirin, li gor xwe qanûnên hilbijartinê guherand û pêşî li dengdana kesên koç kirine girt, got bila hilbijartin çêbibe û jî HADEP'ê re jî got hûn jî "kerem kin", "beşdarî" hilbijartinan bibin. Xwedêgiravî dewletê bi vê yekê jî Ewropa û raya giştî re bida xuyakirin ku ew demokrat in, tu asteng tune ku HADEP'a berdewama DEP'ê ye beşdarî hilbijartinan bike.

Herçiqas heta nuha resmî HADEP'ê helwesta xwe diyar nekiribe jî, wusa xuya ye HADEP wê beşdarî hilbijartineke weha ne demokratîk nebe. Hêzên siyasî yê netewî çî bigre bi yek dengî dan xuya kirin ku hilbijartinên 4'ê Çileyê Pêşin ne demokratîk in, ne meşrû ne û wê ew wê hilbijartinê boykot bikin. Di derheqa hilbijartinan de belavoka YEKBÛN'ê (Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê) û ya Teverga Sosyalîst a Kurdistanê ket destê me, em bi kurtî helwesta her du partîyan,

herweha di derheqa vê yekê de helwesta hin rojnameyên siyasî ku di hejmeta 57'an a Medya Guneşî de derketiye bi kurtî didin:

**YEKBÛN:** "YEKBÛN di wê baweriyê de ya ku hoyên hilbijartina wan û çakî û kêmasiyên karê wan ê di meclîsê de çî bin, bila bibin, divê li 13 parlamentêrên DEP'ê yê ku gelê me di Çiriya Pêşin a 1991'an de bi dengên xwe hilbijartibûn, xwedî bê derketin. Biryara hilbijartinê qismî û hêviya ku dewleta Tirkî jê dike ev e ku di şexsê "mehkeme kirin" û mehkûmkirina huqûqî ya 8 parlamentêrên ku 7 ji wan endamên DEP'ê ne, mehkûmkirina siyasî ya mafên netewî û demokratîk ên gelê Kurd û têkoşina wî ya ji bo van mafan e. Divê ev hêviya dewletê neçe serî.

YEKBÛN jî ber van sedeman, ji bo riswakirina planên dewletê gazî hemû gel û hêzên netewî û demokratîk dike, daku li Kurdis-

Dûmahik: r.11

### Armanç

Rojname Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon: M. Eli, Hesen Mizgîn, Mûrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî,

Redaktorê berpirsyar: M. Eli, Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj,

Berpirsiyarê rûpelên edebî: Ehmed Huseynî

Utges av: Kurdîska Demokratîska Arbetarunionen

Abonetî/Prenumeration: Abonetîya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewropa: 60 DM, Li derveyî Ewropa: 50 \$,

Anons/ilan: niv rûpel/en halvsidan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 50 37 99-9

Adres: Box: 152 16

161 15 Bromma/Sweden



# Li girtîxana Diyarbekirê xwîn û kuştin

Dewlet bi hemû hêza xwe û di her qadî de êrişên xwe yên dirindane li ser gelê Kurd didomîne. Li gel îşkence kuştin û hilweşandina gund û bajarokan nuha jî dewlet êrişên xwe dibe ser girtîxanan. Dewlet dixwaze di hemû waran de berxwedana tevgera siyasî ya Kurdî hilweşîne. Bê şik ji van keleyan yek jî girtîxane bûn, girtiyên azadiyê û serxwebûnê bûn.

Roja 4'ê Çiriya Pêşin piştî haziriyek bi bahana ku girtiyekî bi navê Erdogan Dinçer ji qoxûşa 27'an bibin qereqolê îfadeya wî bistînin, bi temamî, polis, esker û qerdiyan bi hev re êriş birin ser girtiyên. Di êrişê de bombe, çek, balyoz, qazme, bêr, şivên hesinî, cop bi kar anîn. Êrişa li ser girtîxanê 13,5 seetan dom kir. Di êrişê de du kes hatin kuştin, 150 kes birîndar dibin.

Li gor agahdariyên Oda Tabîban ya Diyarbekirê 50-60 girtiyên birîndar li Nexweşxana Dewletê, li servîsên cerahiya mêjî û ya ortopedî tedawî dîtine, 13'ê wan hîn jî tedawî dibînin. Ji birîndaran 2 kes bi çek birîndar bûne.

Piştî bûyerê 248 girtî neqlî girtîxana Entabê kirin. Birina girtiya bo Entabê jî dide xuyakirin ku ev êriş ji berê de hatiye amade kirin. Beriya du meha bêyî ku sedemek bê nişandan girtîxana Entabê vala kirin. Girtiyên li wê li girtîxanên cuda belav kirin. Diyar e roja biryara valakirina girtîxana Entabê hatiye dayin vir ve haziriyê vê êrişa girtîxana Diy-



Ji derve jî malbatên girtiyên di greva birçibûnê de ne

arbekirê hatiye kirin.

Girtiyên ku neqlî girtîxana Entabê kirine heta nuha nehiştine ne mirovên xwe û ne jî tu kesî bibînin. Ev yek bû sedemê gelek spakulasyonan, navên gelek girtiyên wek kesên wundabûyî di çapemeniyê de derbas bûn. Girtiyên ku neqlî Entabê bûn, ketin grewa birçibûnê. Dûre 26 kes ketin grewa mirinê.

Bûyerê girtîxana Diyarbekirê û ya berî wê ya Konyayê di nav rayagiştî ya Kurdî û ya demokratîk ya Tirkîyê de deng veda. Mirovên girtiyên li Entab û Mersîn û li gelek ciyan jî ketin grewa birçibûnê. Girtîxana Adiyamanê, Amasyayê, Malatyayê, Kutahyayê, Maraşê, Ruhayê, Aydinê, Ceyhanê û ya Bartinê jî ketin grewa birçibûnê.

## Axayekî nimûne

Eşîra Gerdî, eşîreke mezin e, li der dora Hekariyê bi nav û deng bûne, lê îro li Kurdistanê azad nêzî Hewlêrê bi cî bûne.

Di 28'ê Tebaxê de me serokê eşîrê Fadil axa li gundê wî, Cejnekan ziyaret kir. Cejnekan 10 deqîqeyan duri Hewlêrê ye.. Wexta tirimbêla me li ber deriyê wî rawestîya, Fadil axa hat ber tirimbêlê û yeko yeko destê me guvaşt û xêhatinî li me kir. Qesra wî bi desenên û bi xalçeyên Ecem hatibû xemilandin. Li ber qesra xwe bi motîvên qesrê mizgeftê jî ava kiribû. Du jinên wî û ji her yekê du lawên wî hebûn. Ji cilên wan, ji rabûn û rûniştina wan, Axa û lawên wî jî endamên eşîrê yên din dihatin cudakirin.

Hecî Fadil, di axaftina xwe da digot: "Axa ji bo felexan e, Muxtar ji bo gund û hukûmet jî ji bo ji civakê re xizmetê bikin hene." Fadil axa her sal milyonek dînar alîkariya kesên feqîr dikir. Genim û cehên wî li ber mala wî, li ser benderan bû û xelkê feqîr dihat ji xwe re dibir.

Li gor Axa digot eşîra wî nêzî 30 hezar kesan bû û li çend gundan hatibûn belavkirin. 70 hezar donim erdê wî hebû, debara wî li ser wê û li ser xwedîkirina pez bû.

Di dema enfala Seddamî de; ji Dihokê eşîreke welatparêz ku ji 4 hezar kesan pêk hatibû, tê surgûnkirin û li nêzî Hewlêrê bi cih dibe. Ji tîrsa Seddamî tu kes ne nan û ne jî av nedaye wê eşîrê. Fadil axa bi mehan li ber xwe daye û ev çar hezar kes xwedî kiriye. Fadil axa li ser vê bûyerê weha digot: "Ma Kurdî çî ye emê çawa û kengê xwe bidin îspatkirin, wexta min alîkariya wê eşîrê kir, min îdam jî girtibû ber çavan." Wextê Seddamî zabîten xwe dişandine ser, Axê bi bertîlan xwe xelas dikir.

Axa bi vê yekê jî nema ye. Wexta enfala Seddamî axê bi pareyên xwe û bêtirs sê heb ka-

meriyên videoyê peyde kirine û enfala Seddamî bi jîndarî xistiye videoyê û dawiyê ev video ji bo kirinên hov yên Seddam li hember kurdan di raya navneteweyî de bûye delîleke qenc.

Axa, li ser şerê birakujiyê jî dîtînin xwe eşkere digot: "Li Tirkîyê li hevhatin nabe. Li Îranê, Sûriyê û li Îraqê jî nabe. Pêwîst e Kak Mesûd û Mam Celal bi ya Kurdan û hêzên Kurdan bikin û bi vî hawî şerî rawestînin."

Îro ev Axa yê welatparêz bi hazaran pêşmergekên xwe ve, ji aliyê maddî û manewî di bin emrê welatê xwe yê azadkirî de ye. Hin hêzên Kurdistanê Bakur bi siyasatên xwe yê çewt gelek eşîr û axayên welatparêz ên Kurd bi aliyê dewletê ve dahf dan. Pêwîst e ji tecrubeyên Kurdistanê Başûr ders bîne sitandin.

Faris Can



Serokê aşîreta Gerdî, Hecî Fadil

## NEYNIK

### Ji hukûmeta federe re televîzyonek navendî pêwîst e!

Nusret Hacî

Ji hemû dezgehên rojnamevaniyê îro televîzyon xwe-diya rola herî mezin e. Hinek taybetmendiyên wê hene: cihazeke biçûk e, dikeve nav hemû malan. Di malê de bi rola mamostatiyê radibe û her roj dema ku endamên xêzanê li ber televîzyonê derbas dikin, zêdetir dibe. Nemaza li welatên ku xwendewerî lê kême girîngiya rola Tv. ê zêdetir dibe. Ji ber ku pirtûk, kovar, rojname, her yek ji wan çend hezar nusxe çap dibin û belav dibin. Anku çend hezar kes dikarin bi dest xî, bixwînin û sudekê jê werbigrin. Lê bi milyonan kes dikarin di eynî demê de li televîzyonê binêrin. Tv. wêneke bi livîn û bi ziman e: bi giyan e.

**Eger hukûmeta federe bê tv. bimîne, hukûmetek lal e, dengê wê ji derazînkaxaniyê wê zêdetir dernakeve û nagihe cihanê. Her weha li Kurdistanê başûr gelê Kurd ber bi yek armancê ve nameşe.**

Berê bisporên Amerîkî di wê baweriyê de bûn ku kilîse, xêzan û xwendixane mirovî pêdighînin. Belê di van salên dawiyê de sosyologên Amerîkî piştî lêkolîneke berfireh gihîştine wê baweriyê ku di guhertin û pêşketina mirov û civakê de rola mezin a televîzyonê ye. Ji ber xatirê programên televîzyone, %55 xêzanên Amerîkî dema xwarina xwe û %60 jî dema raketina xwe guhertine. Li Kurdistanê başûr şertên dewletbûnê zêdetir ji bo her du partiyên mezin derbas dibin. Ji ber ku ew xwedî leşker, aborî, asayîş, kovar, rojname û xwedî kanalên televîzyonê ne. Lê hukûmeta ku ji aliyê gel hatiye hilbijartin ji van elementan bê par e. Lewra rol û dengê wê di nav millet de bilind nabe. Her du "hukûmetên din bi hêz diketin, dengê wan digihîşt millet; ji bo partî û berjewendiyên xwe propaganda dikirin û ageha wan ji êş û derdê millet nemabû. Ev sedemê serekî bû ji bo rûdana şerê navxwe. Nişandana reportajên şer, kuştî û birîndaran, cihên kavi û wêran û di televîzyonên xwe de gunehkar kirina hevdû bû sedema peydabûna dilreşî, nahiye û neviyana beşekî gel ji bo beşekî din e gel. Rojnamevanekî Lubnanî ku 15 salan di tv. a navendî ya Lubnanê de xebitiye, dibêje "yek ji sedemên dirêjajotina şerê navxwe yê Lubnanê ev bû: her partiyekê radyo û kanalên televîzyonê yên taybetî hebûn. Reportajên şer nişaxelkê xwe didan û aliyekî aliyê din pê gunehkar dikir. Ev jî bû sedem ku di navbera Durzî, Mesîhî û Musilmanan de nexweşî û hevneviyan peyda bibe û bîn beramber hev."

Daku Kurd ji vê nexweşiyê xilas bibin, pêwîst e hukûmeta federe tev dezgehên kanalên televîzyonekê bi rêk bixe û tv. ya navendî ji bo hukûmetê deyne ku li seranserê Kurdistanê başûr xelk bikaribe programên wê bibînin. Eger îro ev îmkân nebin, divê binke û dezgehên tv. yên ku niha hene bikevin bin kontrola hukûmetê, bibin malê dewletê û di berjewendiyê hemû cîn û texên gel de bîne bi kar anîn û ew tv. bibe zimanê hukûmeta federe ji bo raya giştî ya cihanî û raya giştî ya hundir. Di dema hilbijartinan de divê ev Tv. wekhev rê bide programên propagandayê.

Her du partiyên mezin pêwîst e di warê dewletbûnê de bi berpirsiyariya xwe rabibin, di warê avakirin û xurtkirina dezgehên netewî de karê hukûmeta federe hêsantir bikin û hemû dezgehên îdarî, civakî, kulturî û aborî yên di bin destê xwe de pêşkêşî dewleta federe bikin. Pêşkêşkirina dezgeh û binkeyên televîzyonên partiyên xwe wê bibe gawek ji bo kêmkirina nakokiyên di navbera beşên gel de û bibe sedemên kêmkirina dijayetiya di navbera her du aliyan de. Mafê her Kurdekî heye ku van daxwazan ji her du partiyên mezin yên Kurdistanê başûr bike.

Eger hukûmeta federe bê tv. bimîne, hukûmetek lal e, dengê wê ji derazînkaxaniyê wê zêdetir dernakeve. Û dengê wê nagihe raya giştî ya cihanê. Her weha li Kurdistanê başûr hemû aliyên gelê Kurd ber bi yek armancê ve nameşe.



**RAMANÊN RAMANWERAN**

**N**etewe çi ye? Kengê derketiye meydana siyasî? Milletbûn çawa pêk tê? Çiye ku civatan dike millet? Pirs dikarin zêde bin. De-fînasyonêk ku mirov karibe ji bo millet bêje û ev defînasyon wek qalib li her derê bête bi kar înan ne mumkun e. Li gel vê jî îro du bîr û rayên sereke hene. Yek jê, ku li rojava dihête bikaranîn; dewlet û netewe di maneyekê de tîn xebitandin. Ango ger tu dewlet bî tu wek netewe tê qebûlîkirin an na tu nahê qebûlîkirin. Ya duhemîn ku zêde chemiyet û qîmeta wî nemaye, ya komünistan an jî ya ku bi navê Stalîn ve tê girêdan. Ku ew jî di eslê xwe de wek rojavayê difikire. Ji ber ku Stalîn yekîtiya îktisadî yek ji esasên milletbûnê dide pêş û bi ya wî civatên ku wan şertên ku ew dij-mêre pêk neyînin nabin millet. Lê nabêje gelo bê dewletê çawa yekîtiya e-konomîk dikare pêk bê? Ji alî din ve li gel ku Stalîn dibêje Yahudî ne millet in, lê gava Cûhiyan dewleta Îsraîl avakirin yek ji dewletên ku pêş Îsraîl naskir di bin serokatiya Stalîn de dewleta Sovyet bû. Ango gava polîtîka destbide bihayê teoriyê hîç namîne!.. Ji hêla dinê bi dehan dewletên ku li Afrîka hatin damezrandin, rewşa Kurdan, Erîriyan, û gelek civatên din, bi wan teoriyên pûç nahên îzahîkirin...

Baş e divê mirov li çi mîze ke? Divê pîvan çi bin? Helbet bersiv ne hêsan e. Me berê jî got bersivê ku li her derê wek joker bête bi kar anîn nîne. Lê li gel vê yekê jî, civakên ku qedereke hevbeş parve dikin û xwezanîna kolektîf li ba wan di derbarê kultur û welat de heye, dikarin esasê milletbûnê bin. Lê belê divê bête gotin ku prosesa milletbûnê prosesek dirêj û aloz e.

Berî hertiştî, fikrên netewebûnê û dewletên netewî li herderê bi hev re di demeke kurt de negihane qonaxeke bilind. Emrîka, Ewropa, Asya û Afrîkayê di vî warî de gelek ji hev cuda proses derbas kirin û dikin. Berî ku li Ewropa dewletên netewî gul vedin li Emrîka û Emrîka Latîni dewletên serbixwe yên millî hatin avakirin...

Li Ewropayê, piştî şoreşa Fransayê ya sala 1789'an pêlên fikrên nasyonallîzmê belav bûn; xwe fîreh kirin. Şoreşa sala 1789'an bi xwe re rakirina xanedan, aristokrat û şahîtiyê (king) anî. Li ser alaya şoreşê fikrên liberal cih girtin. Edalet, wekhevî û azadî drûsmên hevwehatî hate qebûlîkirin û hîl-bijartinên giştî ketin rojava siyasî. Rola zimanên pîroz di civatan de kêmbû, meşrûyeta birêvebirên civatê, yên wek Şah, malbatên xanedan û aristokratan hat hejandin.

Piştî tevliheviyên cûr be cûr Napolyon û fermandarên Fransayê û şerên li seranserê Ewropa dest pê kirin. Ji hêlê îransyan bi xwe re fikrên nasyonallîzmê belav kirin, ji hêla dî ve jî gelên dî, yên Ewropa li hember Napolyon serî hildan. Bi kurtî sedsala 19'an li Ewropayê bû sedsala damezrandina dewletên nasyonallî.

Împaratoriyeke wek Awisturya-macarîstan û paşê Împaratoriyeke din wek Osmanî û Rûsa hilweşîyan û gelek dewletên cuda peyda bûn.

Modelên ku li Ewropayê rû dan û li der û dor belav bûn, li gelek welatan şiklên cuda girtin. An ku li gelek welatan, gelên bindest li hember dagirkeran serî hildan û dewletên xwe yên serbixwe ava kirin; lê ji ber gelek seba û ne-demokratîkbûna wan dewletên nuh avakirî kêmbûneteweyên wan dewletan tûşî gelek zehmetî û nexweşîyan bûn. Yên ku duhî li hember dagirkeran şer dikirin, zilm û zordariya ku li wan dibû bi tundî acizbûna xwe nişan didan, îcar wan bi xwe metodên serdestên xwe, yên kevin bi kar dianîn. Fikrên neteweyetiye naveroka xwe ya destpêkê di destê serdest û

siyasetvanên Kurd di vî warî de çawa ye? Ya giring eve. Ango rewşenbîr û siyasyên Kurd tiştên ku di vî warî de pêwîst in bicih tînin an na? Bersiva vê pîrsê di kar û xebata ku di vî warî de dibe veşartîye. Îro kovar û rojnameyên ku ji alî Kurdan li Tirkiyê û derveyê welatî tîn derxistin, çapkirin û xwendin bi piranî û giranî bi zimanê Tirkî ne. Tirkî zimanê resmî yê dewleta Tirk e. Ev dewleta ku 70 sal in Kurdan dizarinê; kultur, ziman, folklor, edebiyat bi kurtî hebûna me Kurdan bi carekî înkâr dike û me wek Tirkan dihesibîne, tiştên ku ji destê vê dewletê tê texsîr nake; da ku karibe Kurdan asimîle bike. Giraniya pîlîtîka xwe daye ser, helandina Kurdan di nav Tirk de li ser esasê tunekirina zimanê Kurdî. Li gel vê polîtîkaya dewletê, gava Kurd

telewîzyonên Kurdî tune ne. Baş e li gel hemî ev tiştên ku ji bo me Kurdan negatîf in û di ser de jî em Kurd bi xwe zimanê xwe biçûk bibînin û bêjin zimanê me "têrî xwe îfade kirinê nake", mirov nikare pê meseleyan munaqêşe bike an jî her tiştî binivîse, wê gavê ew xwenasîna millî, ku bi zimanê kare bê vejîn dê çawa di zanîna insanê Kurd de bi cih bibe?

Damezrevanên dewleta Turk pîrsa wan ka çawa Balkan hunda kir dipîrsin û bersiv didin: Dibêjin ji ber ku me rê li ber wan milletan negirt; gava wan milletan dest avêtin edebiyat, ziman û kultura xwe bi vî awayî hissên millî bi gelê xwe re çêkirin. Ev bû sebebê cudabûna wan gelan. Rast dibêjin. Ji ber ku ew his û ruhê ku di nav millet de çêbe tu hêz nikare wî tune bike. Ji ber ku di mejiyê mirovan de, di mejiyê milletan de xwenasîna hevbeş

navçeyê bûne), qîmet û xweşiya zimanê zikmakî, gelêrî yê gelê kurd di ser zimanên dagirkeran û zimanên olî (pîroz) û edebî, yên wê demê re digre. Ew vî tiştî bi pênuşa xwe bi hemî vîn û zanîna xwe li ber xwendevanên kurdan, zana û civata kurdan bi vicûd dike. Ev herdu krîterên berbiçav di hemî fikrên neteweyî de xuya ne...

Lê van îdeyên neteweyî di nav xelqê de zêde cî negirtin. Ji ber tunebûna çapxanan, tunebûna weşanên din ji bo ku ev fikir belav bibin kem bû. Li hêla dî, eşîr û begên kurdan ne bi hev re bûn. Yekîtiya Ehmedê Xanî dixwest pêk nedihat. Kurdistan di nav du dewletên mezin wek mintiqeyêke tampon û ji bo her du dewletan (Osmanî û Faris) jî qada şer bû. Begên ku xortbûnek peyda dikirin jî ev xurtbûna wan têrî sentralîzmê, an-go yekîtiya gelê kurd nedikir... Bi pîrsa me ve girêdayî

li vir ya giring e: Ji ber van fikrên hêja mirov bi hêsanî dikare bêje ku Ehmedê Xanî di vî warî de pêşeng e.

Piştî vê kurtenivîsê, mirov dikare bi çend nuxteyan pîrsgirêkê bîne ziman û çarçova têkî-lîyên navnetewî we-ha deyne:

a) Netewe ne ku hebûne lê di dîroka gelan de di demekê nêzik de derketine rojevê.

b) Netewe fenomenek sosyolojîk e, li ser erdeke "xuya" bi kulturek xweser, bi zimanek gelêrî û qederek hevbeş xwe şanî me dide.

c) Ger mirov rewşa siyasî bide hêlekê û li pîrsgirêkê mîzeke pîr eşkere ye ku netewe, civatê bi awayek xurt digêhîjîne hev û ta-kekesên (ferdên) civatê bi hev re dikelîne, angê ger di civatê de berjewendiyên cûr bi cûr hebin jî ev nabin astengek mezin ku civat, netewe nikare xwe li hember êrişên derve xwe ragire.

ç) Îro nexşeya siyasî li dinyayê ji dewletên nasyonallî pêk hatiye. Têkîliyên navnetewî li ser vî esasî xwe nişan didin. Peymanên navnetewî li ser vî bîngêhî dihêne pejiwandin.

d) Îdeolojîyên cuda ku di civatekî de di warê birêvebirina civatê, siyaseta hundir, li ser formasyon civat, bac û gelek tiştên din karin rolek bilîzin, lê mirov pîr eşkere dibîne ku di derbarê siyaseta derve îdeolojîyên cuda rolek mezin nagrin ser milê xwe. Ango berjewendiyên civatê bi giştî dikevin pêşiyê.

e) Her civat kêmbû zêde sistema ku îro di dinyayê de heye û têkîliyên navnetewî di çî rewşê de ne, mecbûr e xwe li gor wê organîze bike.

f) Di siyaseta navnetewî de dost û kêmdostan mirov li gor dem, berjewendîya welatî û pîrsa ku di rojevê de ye hildibijêre. Lê tiştê ku mirov hay jê hebe ew jî ev e ku, divê rêzlegirtina mafên mirovatî, demokrasî û aştîya navnetewî, di têkîlî û xebata mirov ya navnetewî de xwediyê cihekî bilind bin.

# Netewe, xwezanîna netewî û rola zimanî

S. Roşan

rêvebirên cûr be cûr de şiklek di digirt û di bû wasita zilm û zordariyê. Şovîzîzm pêş diket, xurt dibû... Lê digel hemî van ecêbiyan divê bête gotin ku, fikrên neteweyetiye di bîngêhê xwe de, angê heqê çarenûsa milletan heqê wan yê ziman, kultur, welatê wan û birêvebirina civakê bi xwe di esasê xwe de heqê insanî ne, ji bo hemû netewan pêwîst in...

## Em Kurd

Li ser Kurdên perçeyên din zêde tiştêkî di vî warî de nizanîm. Angê his û ruhê Kurdayetiye di nav gel û kesên siyasetmedar de di çî rewşê de ye, ruhê neteweyetiye bi awayekî kamil bi laş û gewde bûye an na? Di wan parçeyên Kurdistanê de asimilasyona Kurdan di çî radeyê da ye? Kurd xwe çawa bi nav dikin? Derbareyê zimanê Kurdî, mefhûma welatî bi şeweyekî dîrokî û erdnîgarî dihête famkirin an na? Ji çanda (kultur) Kurdî çî tê famkirin. Heskirina ziman, kultur, welat li cem Kurdan çawa ye? Lê li ser rewşa Kurdên bakûrê Kurdistanê hin tiştan mirov dikare bêje. Tiştê ku mirov li vî parçeyê Kurdistanê dibîne ev e: Kurd li vir di çarçova his û xwenasîna millî, bi maneyeke kamil çî mixabin tînegihîştine. Angê Kurd jî vî aliyê ve lawaz in. Ji zimanê xwe, welatê xwe, kultur û dîroka xwe agahdarbûn û di maneya xwe nasînê de gelekî kêmasî û anormalî xuya dibin. Erê rast e Kurd di rewşekî gelekî dijwar de jiyana xwe didomînin, zilm û zordariyêke nedîtî li wan tê kirin; ji ber vê yekê jî mirov nikare ji xelkê, kirîterên ku ji bo milletên din normal in bixwaze; an jî di şirovekirina pîrsgirêkê de, vî rewşa han bi bîr neyîne. Lê ya ku ez li vir dixwazim bînim zima ne rewşa "xelkê normal" e. Li vir xala ku divê mirov li ser bisekine ka gelo helwesta rewşenbîr û

zimanê xwe nepeyvîn, bi zimanê xwe nenivîsin û têkîliyên xwe yên bi hev re bi zimanê xwe yê zikmakî îfade nekin û ya herî giring bi zimanê xwe nefikirin dê, bi çî awayî karibin xwezanîna neteweyetiye peyda bikin; vejînin? Şûna zimanê xwe bi zimanê Tirkî peyvîn karê dewletê hêsan dike!. Ji ber ku ziman his û ruhê neteweyetiye di laşê mirovên Kurd de bi cih dike. ger mirov ew hisên ku bi ziman tîn vejînin, bi wasita ziman di mejiyê insan de bi cih dibin xwedî neke, fikrê milletbûnê peyda nabe!

Ger mirov hay ji ziman, kultur, dîrok û xwenasîna xwe nebe gotina "ez Kurd im" zêde tiştêkî îfade nake. Ji ber vê yekê jî li gel ku objektîf, mirov Kurd e angê ji dê û bavê Kurd dihê, heger xwenasîna millî di xwezanîna mirov de bi cih nebe, mirov dikare tûşî gelek rewşên negatîf bibe û dijberê rewşa xwe ya objektîf cih bigre.

Dewlet, bi milyonan Kurdan ji ser axa bav û kalên wan, mecbûrî koçîkirinê dike. Bi milyonan Kurd li rojavayê Tirkiyeyê di nav Tirkan de bi cih bûne. Bi vî metodê dixwaze Kurdan asimîle bike. Wan ji erdê wan ê dîrokî dûr bixîne, ji kultura wan yê ku di nav axa wan de bi laş û gewde ye, li ser axa wan bi mane ye; û kultura ku di nav axa wan de veşartîye, bi wan metodên xwe yên kirêt tar û mar bike. Li gel vê, gava Kurd li gel Tirkan di nav bazara wan, li dibistanên turk û di bin tofana radyo, telewîzyon û propagandayên dewletê bîmînin dê karibin çî bikin? Neslek an nesla duhemîn dê piraniya wan asimîle bibin. Ji ber ku li hember asimilasyonê Kurd wê nikaribin xwe biparêzin. Wê nikaribin, ji ber ku xwenasînek kamil ya millî li cem Kurdan kêmbû e, bi laş û gewde nebûye. Pirtûk, kovar, rojname bi Kurdî demakevin! Radyo,

peyda dike. Zanîna qedera hevbeş divejîne. Û gava millet tûşî problemên giran bibe jî, ji ber xwezanîna kolektîf millet dikare li ber xwe bide û xwe biparêze...

## Ehmedê Xanî fikrên neteweyî

Mirov bi rehetî dikare bêje ku hîmdarê îdea neteweyî ya gelê Kurd, zaneyê mezin Ehmedê Xanî ye. Baş e Ehmedê Xanî di vî warî de dike pêşeng? Mirov van krîteran bi çend xalan dikare bîne ber çav:

a) Bi zimanê kurdî nivîsin û heskirina zimanê kurdî li cem wî.

b) Cudabûna kurdan ji gelên din li ber çav raxistin û yekîtiya gelê kurd, di şertên wê rojê de di bin serokatiya Padîşahekî Kurd de dîtin.

c) Yekîtiya welatê kurdan.

Helbet mirov nikare bêje ku ev fikrên ha tenê xeyalên an jî fikrên Ehmedî Xanê ne. Angê di wan rojan de li ser rewşa Kurdan hatine munaqêşekirin. Beg û Xanedanên kurdan li hember êrişên dagirkeran xebat kirine; lê ji ber gelek seba û cûr be cûr Kurdan nikaribûye yekîtiya xwe pêk bînin û daxwaza Ehmedê Xanî bi laş û gewde bikin, da ku Kurd bi bin dewlet û xwe li hember dagirkeran biparêzin. Ev rewşa Kurdan helbet li cem zanayê Kurd yê gewre Ehmedê Xanî, kifş bûye. Bi nivîsên xwe xwestiyê rewşa kurdan bi awayekî zelal li ber çavan raxîne. Ev zanayê gewre di dema xwe de rê nişa dike. Ew rîya rizgarîya Kurdan di yekîti û hêzbûna Kurdan de dibîne.

Ji ber vê yekê Ehmedê Xanî ne tenê nivîsevanê berhemên edebî ye. Li gel vê Ew mefhûma welatî (axa ku kurd li ser dijîn û bi hezar salan vir de rûniştvanên wê



## Lêkolîn

## JI BELGEYÊN KU NÛ ÇAP DIBIN

Serê sala 1994-an, bi navê Dîrektoratet (Dîrektorya) pirtûkek li Swêd çap bû. Eslê pirtûkê sala 1994-an bi Ingilîzî li Emerîka hatiye çapkirin. Ji ber balkêşiya naveroka wê pîr zû hatiye wergerandin. Belkî ji ber ku beşek jê di derheqa R. Wallenberg de ye û Swêd ji nezik ve eleqedar dîke, zû hatiye wergerandin.

Pirtûkê biranînên Pavel Anatoliyevîç Sudoplatov e. Sudoplatov sala 1907-an li Ukrayna li bajarê Melitopol hatiye dîne. 1919 bi dilxwaziya xwe ketiye nav Çekan (dûre GPU û OGPU jê tê avakirin). Wek nefer û telefonîst kar dîke. Hîna di xortaniya xwe de, sala 1927-an fermî dîkeve nav OGPU (daîra siyasî a dewleta yekgirtî). 1928-an dibe berendamê partiyê. 1933-an dema V A Balitski bû dîrektore OGPU ya Ukrayna û dîrektore duyemîn e OGPU ya hemû Sovyetistanê. Sudoplatov jî ji Ukrayna bi xwe

re dibe Moskova. Di beşa OGPU a karê derve, (dûre navê NKVD, daîra bilind a ewlekariya dewletê lê kirinê) dîrektoriya yekem de bû mifetîş. Karê wê daîrê bi bingehîni îspiyon û sabotaj in. 1941 bûye dîrektore Büroya ji bo karên taybetî ya NKVD. Sala 1953-an ev nav hemû radibin û dibin KGB.

Sudoplatov pîr li derve xebitiye. Salên 1937-38 di keştiyêke baran de li pîrriya welatên rojava bi navekî ne rast wek operatore radio geriyaye. Ew li Almanya çekdarên li hember Nazîyan organizekirine. Yek ji wan kesên ku projeya bomba atomê dizîne. Di şerê Îspanya ê navxwe de wek yekî Polonî beşdar bûye. Ramon Mercader, ê ku Troçki kuştîye, li wir hevalê wî bû. Ewî kuştina Troçki organize kiriye. Lê Sudoplatov ji kuştin û wendakirîni di salên 1930 û 1940-an de bûne, ne pak e.

Sudopkatov 1953 hatiye girtin,

1958-an 15 sal ceza xwariye, 1968-an ji hepsê derdikeve. Lê li hember dewletê di bin tawanbariyê de dimîne. 1991 ji tawanbariyê pak dibe. Lawê Sudoplatov, Anatoli Pavlovîç, li Unîversîteya Moskova Profesore. Ji bo berdand û dûre jî ji bo pak derxistina bavê xwe gelekî xebitiye. Li gor baweriya wî, bavê wî, tiştên ku kirine ji bo dewletê, bi emrê ku jê re hatine kirine.

Xwest ku biranînên wî bîn çapkirin. Navê rojnamevanê TIME Jerrold Schecter bi munasebeta biranînên Krûşçov bihîstûbû. Û bihîstûbû ku Leona Schecter jî li tiştên wilo digere. Pêwendiyên bi wan re datîne û hevdû dibînin. Pêşniyareke balkêş bû, lê gelek ewraqên ku pêwîst bûn hîna bidizî bûn. Sala 1992-an mumkun dibe ku xwedî û rojnamevan li ewraqên ku berê bidizî bûn bînerin. Ew jî wê çaxê dest pê dîkin. Ji biranînên wî û ewraqên

di derheqa wî û karê wî de, pirtûkek 525 rûpel tîn çapkirin.

Pirtûk, dema nû derket ket destê min, wan rûpelan bala min kişandin, lê ji ber hinek karên min, ez dereng lêvegeriyam. Rûpelên 277 û 282 hemû di derheqa Barzanî û Kurdan de ne. Min ew rûpel wergerandin Kurdî. Armanca min ne ku ez tiştina di derheqa Barzanî de eşkere bikim, ya jî piştgiriya rastbûna kesên dijî sosyalîzme bikim. Di derheqa bûyereke girîng de, tiştên girîng hatine gotin, baş e ku ev tişt ji Kurdan re jî eşkere bibin.

Di demeke ku Kurd bi çekên giran li ber hevdû rûdînin û gund û bajarên "hevdû" hildiveşînin, belkî nivîseke wilo hişê Kurdan hinekî bine serê wan û bê bîra wan ku xelk di derheqa Kurdan de ne wek ku soz didin difikirin.

S. BENGİN

kolay Zemskov, tercumanê min e ku wek Barzanî xweş bi Ingilîzî zanibû bi min re bû. Barzanî, di vî hevdûdîtina me a duyem de got ku Emerîka û Bîtanya ji bo ku karibin neteweperwerên Kurdan bi xwe ve girêbidin, bertilan didin wan. Barzanî di wê civînê de pêwendiyên xwe ên bi ajanên Bîtanya re jî ji min re eşkere kirin. Ji bo ku karibin tesîrê li rewşa Tirkiyeyê, Iraqê û Îranê bikin û di destên xwe de bigirin, dixwestin ji peyên wî fêde bikin.

Wezîrê Ewlekariyê İgnatiev, planê min bi xwe qebûl kir. Min pêşniyar kiribû ku em tîpekê (Brigad=Tugay) ji 1500 mîrên Kurdan di teknîka sabotajan de perwerde bikin. Me ê bi destê wan karibûya hukûmeta Bexdê a Nurî Seîd bixista. Wê tiştêkî wilo, desthilatiya Bîtanya a li ser Iraqê hilweşanda. Kurd, di planê min de, ji bo karekî din jî bikêr dihatin: Me karibû ew ji bo hewldanên xwe ên di derheqa kontrola li ser petrola ku ji rojhilata navîn diçû ji Ewrûpa û Emerîka re û xwedî grîngiyeke stratejîk bû jî bikar bînin. Heger ku Kurdan karibûya xetên petrola ji Îran û Iraqê diçûn qut bikirana, wê petrola ku diçû ji wan re pîr kêm bikirana.

Barzanî, bi bazara ku wê di nabêra sinorên Tirkiyeyê, Iraqê û Îranê de, ji bo avakirina komareke Kurdan a serbixwe pişt-giriyeke xurt bistîne, hevalbendiya polîtîk a bi hukûmeta Sovyetan re qebûl kir. Barzanî got ku rasttir û hesantir e ger pêşî li bakure Iraqê komareke Kurdan bê avakirin. Li gor hêviya wî herêmên Kurdan ên li Tirkiyeyê û Îranê jî serxwebûna xwe dûre distendin û ew jî tevli komarê dibûn.

Min wê çaxê ji Barzanî re got emrê ku ez karibim dîr û dirêj di derheqa peymaneka wilo de bi te re biaxivim, nedane min, lê em amade ne ku rê bidin te tu hukûmeteka Kurdan a li derve welêt ava bikî. Alikarê min Nikolay Mantjka, asîstanê Borîs Ponomarjov, dîrektore Komîta Navendî beşa navneteweyî bû. Mantjka ji bo vî armançê, soza ku li ciyekî hew dor dehanzdeh kilometre dûrî Taşkent, di buroya kolhozêke de alikariya avakirina partiya demokrat a Kudistanê pê bike da Barzanî. Mantjka ji Barzanî re eşkere kir bê îdarîkirina Kurdan a dewletî çawa dikare di bin komîta navendî a partiya nû de bê avakirin û lê zêde kir ku wê serokê partiyê Barzanî be.

(Dûmahîk di hejmara bê de)

## Çûna Barzanî bo Sovyetistanê

Sala 1946-an, serokê Kurdan Mella Mistefa Barzanî li sinorê Îranê xist û ket Azerbeycanê.

Dostên wan ên Emerîkî û Ingilîzî ew terk kiribûn û ji nîşkê de ditîbûn ku ji yekîniyên Şah re bûne hedef. Peyên Barzanî dor duhezar kesên bûn û çekên wan jî, çekên destan û hinek top bûn. Ji malbatên wan jî dor hezar kesên bi wan re bûn. Hukûmeta Sovyetan ew di kampekê de bi cî kirin û min cara pêşî ew li wir dîtîn. Sala 1947-an, Abakumov, ez bi armanca ku ji bo wî, lîşkerê wî û malbatên bi wan re, heqê penaberîya siyasî pêşniyarî wî bikim, şandim Baku. Û min dê pêşniyar bikira ku em difikirin wan li Ozbekîstanê, li ciyên ne dûrî Taşkent, di malên muweqet de bi cî bikin. Min bi navê Matveyev, wek mudurê duyem ê Tass û berdevkê hukûmeta Sovyetê pê dan naskirin.

Min cara yekem serokê eşîrêkî xas didît. Min têderxist ku Barzanî siyasatvan û serokleşkerêkî şareza ye jî. Ji min re got ku ji wan heştê serhildanên Kurdan ên di van sedsalên dawîn de li hember serdestên Îranî, Iraqî û Tirkiyeyî, me di şêst serhildanan jî wan de alîkarî ji Rûsya xwestiyê û me her dem hinek alîkarî bi awayê çek û fişekan girtiye. Loma jî li gor wî pîrî tebîî bû Kurd di demeke wilo xerab wek a ku hatibûn ba me de, dema ku komara demokratîk a Kurdan ji hêla lîşkerê Şahê Îranê Mu-

ammed Riza Pehlevî ve hatibû hilweşandin, alîkarîyê ji me bixwazin.

Ew kesên ji malbata Barzanî ku bi soza dan û standinan hatibûn xapandin û çûbûn ba Şah, hemû hatibûn daliqandin. Dema Şah şandibû dî Barzanî bi xwe, Barzanî lê vegevandibû û gotibû hew ger Şah qasidan ji malbata xwe bişîne ba min, ez wan li vir li bendî xwe bigirim, ez tîm Tehranê. Dema Barzanî bi Şah re katibû nav van dan û standinan, pîrriya lîşkerên wî ketibûn nav axa Sovyetistanê jî. Me dixwest em Kurdan, ji bo sistkirina desthilatiya welatên dinya rojava a li rojhilata navîn bikar bînin. Dûre me li hevdû kir ku wê Barzanî û hinek ji serbazên wî xwe di akademiyên lîşkerî ên Sovyetan de bigihînin û ku wê bicîkirina wan a li Asya navîn di rêwîtiya wan de hew bibe bînavadanek, bêhnvedaneka xwe amadekirinê ji bo di pêşerojê de li hember Îran û Iraqê şerekî çekdarî lidarxin û Kurdîstanê azad bikin.

Abakumov li min qedexa kir û got ku divê ez agahdariyê di derheqa naveroka peymaneka xwe a bi Barzanî re nedim serokê partiya komunist a herêmê M. Bagîrov û bi taybetî jî ji tu kesan re qet qala soza ku Stalîn di derheqa perwerdekirina wan a lîşkerî de daye, nekim. Hinek ji peyên Barzanî, ji bo avakirina îstasyonek radioko Kurdî ji Azerbeycanê barkirin Ermenîstanê.

Dema ez vegeyîyam Mosko-



Mustafa Barzanî

va, Barzanî jî bi peyên xwe ên ji çekkirî û bi malbatên wan re çû Ozbekîstanê. Piştî penc salan, 1952-an, ez dîsa bi fermana ku Barzanî bibînim çûm Ozbekîstanê, nêzikî Taşkent, ciyê ku Barzanî lê hatibû bicîkirin. Barzanî, ji maqamên herêmî pîrî bi gazine bû û xwest ku desthilata navendî a li Moskova dest biavêje

pirsgirêkên wî û çareser bike. Eşîra wî li kolhozên Taşkent dixebitîn. Barzanî dixwest ku li ser serê şehêzar kesên ji eşîra xwe xwediyê desthilata xwe a serbixwe be. Barzanî ketibû tîrsa ku kontrola xwe a li ser eşîrê wenda bike.

Min û wî li daçake hukûmetê hevdû dît. Serdar Nî-



Sekreterê Giştî yê Partiya Yekgirtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) Îsmail Emo Elî:

# ”Li Sûriyeyê li hember milletê Kurd siyaseteke şovenî li dar e”

Ev hevpeyivîna li jêr çend rojan berî hilbijartina Sûriyê çêbû û bêjî nebêjî çend pirs li ser hilbijartinê jî ji berêz Îsmail hat pirsîn. Lê di wexta hilbijartina Sûriyê (24'ê Tebaxê de çêbû) de partî û rêxistinên Kurd wek sala 1990'î bi hev nekerin û bi du lîstan ketin hilbijartinê. Ji van lîstan yek ji Partiya Yekîti, El-Partî û Partiya Pêşverû (Ezîzê Dawo) ava bû, ya din jî ji alîgirên PKK'ê, Partiya Pêşverû (Hemîdê H. Dewrês), Partiya Sosyalîst a Kurd li Sûriyê, Partiya Demokrat a Kurdên Sûriyê, Hevgirtina Gel, Qewmiyê Sûriyê, Tevgera Asûrî çêbû. Lê tu lîsta qezenc nekir. Vê bêtişfaqiya Kurdan heta çiyekî bû sebeb ku Kurd nûnerên xwe neşînin Meclîsa Sûriyeyê. Lê sedema bingehîn siyaseta rejimê û ne demokratîkbûna hilbijartinê ye. Ji ber ku piraniya bernamzetên parlamentoyê ji aliyê rejim ve têne dest nîşan kirin û yên dimînin jî bo wan hilbijartin çêdibe. Wek nimûne îsal li herêma Cizîrê kontenjanên parlamentaran 15 kes bûn, ji wan 9 kesan rejimê dest nîşan kirin, ji bo 6 kesan jî hilbijartin çêbû. Lê ew 6 kes jî dîsa ji merivên rejimê hatin hilbijartin.

Ne tesaduf e ku piştî Tirkiyeyê îmuneteta DEP'yan rakir rejima Sûriyeyê jî rê neda ku nûnerên Kurdan bikevin Meclîsa Sûriyeyê. Wer xuya ye Tirkiyê û Sûriyê di vî warî de li hev kirine.

**Armanç:** Ji kerema xwe re hûn dikarin li ser jiyana xwe ya siyasî agahdariyê bidin xwendevanên me?

**Îsmail Emo:** Di sala 1963'an de ketim nav rêza Partiya Demokrat a Kurd. Di sala 1965'an de partî hat parçekirin, hingê min xwe da aliyê çepên Kurd û min xebata xwe berdewam kir ta sala 1975'an û jê û pêve ez hatim nav rêza Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El-Partî), û min di nav hemî komik û sazûmanên wê de kar kir ta ku di sala 1980'an de ez hatim hibibjartin wek endamê Komîta Navendî, û herwiha jî bûm endamê Mekteba Siyasî.

Di sala 1988'an de hinek cudaxwazî û nakokî di nav rêzên partiyê de peyda bûn û veqetiyaneke rû da. Piştî vê parçebûnê bi salekê, ango sala 1989'an, de bingeyên partiyê kongireke awarte di bin navê (kongra şeşa yê awarte) çêkirin, ku tê de biryara mesela yekîtiya rêxistinî bi partiyên ku ji alî siyaset û fikir de nêzikî hev in hat stendin. Li ser vê yekê, yekîtiya ku di sala 1990-î de hat meydane, ku ew jî di navbera Partiya Demokrat a Kurd (baskê kongirê şeşê) Partiya Kar a Demokrat a Kurd û Konfiransa Binkeyên Partiya Çep ê Kurd de bû. Vê yekîtiya han partiyekê nû deranî, ku navê wê jî bû Partiya Demokrat a Kurd a Yekgirtî (Yekbûn). Di sala 1992'an de yekîtiyêke dîtir hate meydane, ku ew jî di navbera sê Partiyên de bû, ew jî ev in: 1-Partiya Demokrat a Kurd ya Yekgirtî (Yekbûn), 2-Partiya Rencberên Demokrat a Kurd (Şexîle) 3-Partiya Hevgirtina Gel, ya ku weku partiyekê serbixwe diyar bûbû, piştî wê nekokiya ku bi Serokekê xwe yê giştî Selah Bedrefîn re, belû bûbû. Helbet vê yekîtiyê partiya me deranî, ku navê wê jî bibe Partiya Yekgirtî a Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti).

**Armanç:** Di raya giştî ya Kurdan de tete zanin ku di navbera partiyên Kurdîstana Sûriyeyê de, di warê programatik de ferqek nîne. Ferqa YEKÎTÎ yê ji partiyên din çî ye?

**Îsmail Emo:** Di baweriyê min de rayên cûda yên bîrî û siyasî digêhin salên şestî ku hingê nakokî li ser çend xalan vekêşiya, ji wan wek nimûne: Piştî sala 1965' an partiyên çep berê xwe dan fikrên sosyalizma zanistî û doza piştigiriyê bi kesên rencber, karker û cotkar ji milletê me yê Kurd kirin û piştigiriyê berjewendiyên wan kirin ji bo rizgarkirina wan ji bin darê bîndestiyê çinayeti. Herweha nakokî li ser sirûştê rêxistinê û armançên wê jî diyar bû. Di roja îro de her çend nakokî ne bi temamî diyar in, yan jî wilo tê xuyakirin ku tiştên ne girîng in. Lê nemaze di navbera partiya me û bêtişin partiyên me yên Kurd yên din de şeweyên xebatê û helwest ji hev cûda ne. Ji ber ku em baweriyê herwekî di bernameya me ya siyasî de hatiye nivîsandin bi hemî şewazên demokratî û aştiyane tînin wek: Piştigirî, meş û xwepêşandan Lewra eva han dibe hokarê cûdaxwaziyê di navbera partiya me partiyên dîtir bi giştî. Me ev yeka han di warê piraktîk de jî pêk anî ku hin kar li ser berekî teng de çêbûn. Ev bertengiya han jî havi-lê taybetiya dorûberê me ye.

Herweha ferqa me ji van partiyên din ew e ku em pêwîstî bi afirandina hol û mercên xebatê dibînin da ku em bikaribin gavên nû di rîya kar de bavêjin, bi awakî ku em şeweyên piraktîk peyda bikin, ji bo em bikarin doza xwe bi Ereben Sûriyê bidin naskirin û baweriyê wan bi rast û rawebûna tevgera Kurdî û hebûna gelê Kurd û dadmendiyê doza Kurdî û bi armançên wê yên netewî, binin.

Di vî warî de, partiya me biryar stend ku roja 5'ê heyva dehan bibe helkeftineke salane bi mebesta xurtkirina xebatê ji bo bi destxistina mafê wergirtina nasnameyê ji bo wan Kurdên ku desthilatê ew ji nasnameyê bêpar kirine.

Hevalên me di sala 1992 an de, di vê rojê de li hemû bajarên Kurdî û hin bajarên Sûriyê, li dîwaran pûl zeliqandin, her weha, di sala 1993 an de partiya me bêtir ji 20.000 belavokan di hemî bajarên Sûriyê de belav kirin, bi armanca nasandina xelkên Sûriyê bi rastiya meselan.

Serjimariya awarte ya ku di sala 1962'an de li parêzgeha Hesekê (Cizîrê) hate pê, çawa ku li wê gorê 150 hezar hevweletiyên Kurd ji nasnameyên bêpar man.

Bi rastî hêjayê gotinê ye ku niştîmanperwerên Erebi û Kurd bi giştî razîbûna xwe ji vî awayî xebata me re dan diyarkirin, lê belê ya bêşermî ew bû ku partiyên Kurdî li Sûriyê nerazîbûna xwe derheqî vî karê me yê hêja de eşkere kirin. Ev partiyên han hîç baweriyê bi xebateke weha nînin, bi behana ku çênabe kes rejima Sûriyê aciz bike da ku ew li me sor nebe. Lewra ev partiyên han wilo dibînin ku ya pêwîst ew e ku tevgera Kurdî li hêviya zirûfan bimîne ta ku gelê Kurd vî mafî han weku dana Xwedê bistîne. Lê belê em pêwîstî bi bilindkirina rola xebata demokratîk û aştiyane dibînin da ku em bikaribin mafên xwe bistînin.

**Armanç:** Hilweşandina sistema sosyalist û bi taybetî ji Yekîtiya Sovyet çî tesîr li ser rejima Sûriyeyê kir, siyaseta wê ya derve û hundir û bi taybetî ji siyaseta wê ya li hember gelê Kurd de di pêşerojê de bê guherandin yan na? Dîtina partiya we di vî warî de çî ye?

**Îsmail Emo:** Bê gûman herifandina sistema sosyalist karekî giştî li ser piraniya siyaseta dewletên cihanê kir, ew ji alîkî ve, lê ji alîkî din ve jî, peywendiyekê taybetî navbera Sûriyê û Yekîtiya Sovyet berê de hebû, ku eva han jî bi vî bûyera giran gelek êşiya, ji ber ku Yekîtiya Sovyetê roleke mezîn di warê xurtkirina makîna serbazîya Sûriyê, ji çek û parçeguherana û rawêjkeran, dîleyist. Herweha berevaniya Sovyetê bi giştî di ber mafê Ereban de û bi taybetî jî yê Sûriyê de, bi peymanî hevaltî û hevkarîya navbera wan de hatibûn girêdan. Lewra Sovyetê di "guftûgoyên dewletî" yan jî civînên "Netewên Yekgirtî" de alîkariya Ereban dikir û peywendiyên wan diparast.

Belê di roja îro de û piştî vî guhertinê ku di xerîta siyasî û cografî de hatî meydane, Sûriyê jî vî piştigiriyê serbazî û siyasî bêpar ma. Ji ber vî yekê tiştê li pêşiya

Sûriyê nema, ji bilî ku siyaseta xwe li gel van kiryarên nûjen ku li ser meydana dewletî serê xwe hildane bi saz bike û siyaseteke nermtir bi kargêriya Emerîkî û rijemên Ewropaya rojava re bi kar bîne daku mesela terorîstiyê ji ser xwe rake, ku Ewropiyên û Emerîkîyan ev tişt li dijî Sûriyê bi kar neynin. Beşdariya Sûriyê di kongra Madridê de û nermbûna wê di guftûgoyên di gel Îsraîlê de îşaretên nû ne. Lêbelê rûxandina sistema sosyalist li ser barê nav xwe jî aliyê siyaseta aborî ve ew e ku Sûriyê berê xwe dide siyaseta bazarê û kêmkirina rola dam û dezgayên dewletê (beşê giştî) û xurtkirina rola beşê taybetî û yê hevbeş.

**Ji aliyê din ve jî em dibînin ku herçend siyaseteke şovenî li hember milletê Kurd li Sûriyeyê li dar e, lê belê ev yeka han havi-lê perçebûna tevgera Kurdî ye, ku hîç berxwedan beramberî vî siyaseta şovenî nîne ku bi şeweyekî pêşketîr bi kar binin, da ku rejimê naçar bikin ku siyaseta xwe derheqê Kurdan de biguherîne, nemaze şertên herêmî û navçeyî li musait in ku em ji bo berjewendiyê gelê xwe bi kar binin.**

Ji aliyê siyasî ve jî, Partiya BAAS hîç giraniyê weke berê nade Partiya Komînist a Sûriyê, ji ber ku guhdana rejimê bi Partiya Komînist re di dema berê de encama peywendiyên wê bi Yekîtiya Sovyetê re bû, wilo çêbû ku ev pûtepênkirin giha wî qonaxê ku Partiya BAAS layenek ji her du layenên komînist ji liqên (Cep heya Pêşverû) ji parêzgehan bikin der.

Lê belê derbarî gelê me yê Kurd, guhertinên nû gelek kê mî bûn, tenê bes em nimûneyekê binin bîra we ku ew jî êrîşên dezgehên parastinê bi ser malên hevalên me de û girtina wan wek girtiyên siyasî, îspatek berçav e, bi mehna zeliqandina pûlên dîwaran bû, ku partiya me di sala 1992 an de derxistibû, herweha bi sedema beyanameya ku bîrhatina salane ya serjimariya kirêt ku partiya me di sala 1993 an de belavkiribû. Lewra heta niha bêtişî bîst hevalên me di zîndanên Sûriyê da ne. (Li Sêdneya, Cizîrê û li leqa Filistin) Li gel ku hindêk girtiyên dîtir jî hene encama sedemên dîtir in ku ta niha jî bêşdarî dadgehê

nebûne. Ji ber vî yekê jî me tu hêvî nîne ku guhertinek di siyaseta rijemê Sûriyê de derheqê Kurdan de çêbibe. Ji aliyê din ve jî em dibînin ku herçend siyaseteke şovenî li hember milletê Kurd li Sûriyeyê li dar e, lê belê ev yeka han havi-lê perçebûna tevgera Kurdî ye, ku hîç berxwedan beramberî vî siyaseta şovenî nîne ku bi şeweyekî pêşketîr bi kar binin, da ku rejimê naçar bikin ku siyaseta xwe derheqê Kurdan de biguherîne, nemaze şertên herêmî û navçeyî li musait in ku em ji bo berjewendiyê gelê xwe bi kar binin.

**Armanç:** Ji ber xebata siyasî gelek hevalên we di hefsên Sûriyê de ne. Îro ew di çî rewşê de ne, tu dikarî li ser rewşa wan agahdariyekê bidî xwendevanên me?

**Îsmail Emo:** Partiya me guhdaneke bêhewil da girtî û malîyên wan; herweha xêzan û malîyên heval û niştîmanperwerên me yên girtî bextewar bûn ku guhdaneke bêhewil bi wan bû. Ev guhdan ji du aliyên ve bû; manewî û madî, ji aliyê madî ve ew bû ku her meh pere ji bo her malekê hate terxankirin, ji aliyê menewî ve partiya me weku xudanmal ji wan re bû xwedî, ku vî yeka han jî serfirazî û dilxweşî da wan û vî yekê jî hîşt ku nav û dengê partiya me, çî di gundan de û çî jî di bajarên de, bê belavkirin.

Dervî zîndanê jî partiya me rêz-lêgirtin û qedreki bêhemba didê mîrxasîya wan, û viyana wan ya bihêz di ber dadgehan de. Wek nimûne, emê biserhatiyekê derberî xurtiya wan ji we re bêjin, ew jî ew bû ku her yekî ji wan dixwest bi mîrxasî û bi tenê parastina xwe li dadgehê bike, bêtî ku abûqat parastina wan bike, da ku şoveniya rejim tazî û şermezar bikin. Me wek partî parastina wan wek broşorekê çap kir û li Sûriyeyê û li welatên Ewropayê bi berferehî belav kir.

**Armanç:** Îro jî him rejima BAAS bi resmî Kurda wek millet nas nake. Lê di hilbijartina 90 î de serokên du partiyên û endamêkî partiya Hevgirtina Gel wek parlementer çûn Meclîsê? Vî tiştî hûn çawa îzah dikin?

**Îsmail Emo:** Di baweriyê min de, hilbijartin, rengê e ji rengên xebata siyasî, demokrasi û aştiyane ye ku em baweriyê pê tînin; û gelek tevgerên siyasî, netewî, sosyalistî û civakî ev rê bi kar anîne. Lê belê her bizavek yan jî her partiyek armançên xwe yên taybetî hene di warê daketina meydana hilbijartinê de. Helwesta tevgera me, di hilbijartina 1990'î de ew bû; me ji xelkê re da xuya kirin ku milletê me gelek ihtiyacê wê ji demokrasi heye, û dikarê nûnerên xwe bigihêne parlamen-





İsmail Emo: "Di serjimariya awarte de ya ku di sala 1962'an de li parêzgeha Heseke (Cizîrê) hate pê, 150 hezar hevvelatîyên Kurd ji mafê hevvelatîyê bê par man".

toyê eger fersendeke demokratîk jê re peyde bibe û em di vê de jî serkeftî bûn. Ya dîtir jî ew bû hem jî aliyê mîlet ve û hem jî aliyê desthilatê ve nûnerên Kurd serkirdê û naskirî bûn, vî tiştî rê da wan ku ew hebûna û doza gelê Kurd û hebûna tevgera Kurdî li Sûriyê, di rîya Parlamentoyê de bi nûnerên parêzgehên din re bidin naskirin û êşa xwe ji wan re bibêjin.

**Armanç:** Wextê serokên partiyên Kurd li Sûriyê dibin parlementer, intibayekê li Ewropîyan çêdibe ku pîrsa Kurd li Sûriyê çareser bûye. Hûnê vê yekê çawa izah bikin?

**İsmail Emo:** Gihaştina Parlamentoyê hîç wateyê nade ku mesela Kurdî li Sûriyeyê hatiye çareserkirin, ku eva ha jî di hemû parçeyên Kurdistanê de çêbûye, û weku nimûne, Kurdistanê Bakur li ber çavê me ye çawa ku mîletê wê gelek xirabiyê jî destê serkarên Tirkîyan dibîne. Ya dîtir jî ew e ku desthilatiya Sûriyê li nûnerên me, ne weku nûnerên Kurd weku hevvelatîyên Sûriyeyê mîze dîke û ev jî serokê Parlamentoya Sûriyeyê bi xwe di rojnameya Sefîr de nivîsiye.

**Armanç:** Di demek nêzik de, dê dîsa hilbijartina parlamentoyê li Sûriyê çêbibe. Dîtina we li ser hilbijartinê çî ye? Hûnê dîsa wek sala 1990'î bikin da ku serokên partîyan bibin parlementer? Helwesta PKK yên ku li Sûriyê ne li himber hilbijartinê çîne?

**İsmail Emo:** Di bawerîya min de partiyên Kurdî ji tecrûba xwe ya hilbijartina bûrî siûd wergî-

tiye, ku serkeftina wê havilê yekîtiya wê bû. Niha jî hevdengiyek jî aliyê hemû partîyan ve heye ku pêwîstî bi çêkirina lîs-teyêke hevbeş dibînin ji bo bikarîna nûnerên xwe careke din daku bigihînin Parlamentoyê.

Derbarî PKK'yên Sûriyê, ew jî wê dakevin meydana hilbijartinê wekê cara berê. Bi rastî em wan mifadar nabînin ku xwe bikin aliyek di hilbijartinê de, ji ber ku PKK hîç bernameyê wan di derheqa doza Kurdî li Sûriyê de nîne. Herweha tê xuyankirin ku armanca wan ya sereke ew e ku li dijî listeya tevgera Kurdên Sûriyê kar bikin û eva han jî di hilbijartina Parlamentoyê ya di sala 1990'î de û di hilbijartina endamên kargêriya şazewanî ya sala 1991'î de hat xuyakirin. Lê em hevî dikin ku ew tiştî di paşerojê de çênebê. Lê belê dîsa jî em dubare dikin eger ew bikarîbin xwe bidin ber barê derxistina beyannameyê hevbeş li gel tevgera nişûmanî a Kurdên Sûriyê û di vê beyannameyê de erkên nûnerên Kurdan, armanç û daxwaziyan gelê Kurd li Sûriyê bidin xuyankirin û ronîkirin em amade ne bi PKK'yên Sûriyê re destê xwe bidin hev û di meydana hilbijartinê de bi hev re kar bikin.

**Armanç:** Di warê weşanan de kar û barên partiya we çî ne?

**İsmail Emo:** Di vî warî de rojname me ya Komîta Navendî heye ku bi şeweyekî çak derdikeve, herweha hinek belavokên dîtir yên komîteyên deverî dertên, ku li ser karûbarên navçeyan xwe, û mesela çewsandina netewî di devera Kurdî de didin ber çav. Ji bilî van çapemeniyên hene, du kova-

rên dîtir hene: Yek jê bi zimanê Kurdî ye bi navê "Pîrs" di warê wêje û rewşenbîrî û folklor û dîroka Kurdî de dinivîsê; ya dîtir bi zimanê Erebî derdîçê, bi navê "Hiwar" (gotubêj) ku ew jî raya serbest dide xuyani kirin û her nîvîskarek dibê berpirsê raya xwe be. Hêjayê gotinê ye ku çapemeniyên me, nemaze rojnameya navendî û kovara "Hiwar" cihê razîbûnê ye li nav xwendevanan. Herweha kovara "Hiwar" cihê xwe di nav nivîskarên Ereb yên demokrat de dibîne, ku hin ji wan beşdariya nivîsandinê tê de dikin.

**Armanç:** Têkiliyên partiya we bi hêz û partiyên parçeyên din re li ser çî esasi ne?

**İsmail Emo:** Em weha dibînin ku her parçeyek ji Kurdistanê palpişteke stratejiyê ye ji parçeyê dîtir re, û çî pêxistin, baş yan xirab, di parçekî de peyda bibe, roniya xwe davêjê parçeyên dîtir. Lê belê di roja îro de, her parçeyek di rewşek taybetî de dijî, ku eva ha jî bû sedema her parçeyek tevgerê wê teybetî di rewşa wê ve hebê ku armancên wê dest nişan dikê. Lê belê pêwîstiyek stratejîk e ku girêdanek yan jî bereyêkî Kurdistanî hebê, bi mebesta rêxistina kar û xebatê navbera hemî tevgerên rizgarî-xwazê Kurdistanê de.

Di warê danûstandina me bi partiyên Kurdistanî re, me pîvanine diyar hene ji bo avakirin û pêxistina peywendîyan bi wan re ku ew jî girêdayine: 1-Bi îradeya serbixweyî û dilsoziya wê partiyê, 2-Bi peyrewkirina bernameya wê ya siyasî di parçê ku tê de dijî, 3-Herweha bi helwesta wê ji partiya me û doza gelê me yê Kurd li Sûriyê, lewre tayên peywendiyên me di xurtbûn û rêxistina xwe decihê ne. Li Kurdistanê Bakur peywendiyên me yên xurt û qayim bi Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê (YEKBÛN) re hene. Ev herdu partî partiyên bira ne. Protokolek di navbera partiya me û Hêvgirtin-Partiya Demokrat a Kurdistan de heye. Herweha peywendiyên me normal ligel piraniya partiyên Kurdistanê Tirkîyê hene.

Derbarî Kurdistanê Iraqê, di avakirina peywendiyên hevbeş û li ser bîngeha rêz lêgirtinê peywendiyên me ligel hemû partiyên Cepheya Kurdistanî hene. Lê belê daxwaziyeke hevbeş li nik me û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê heye ji bo avakirin û pêxistina peywendîyan navbera me, lê hokarê dîrbûna coxraffî û li gel hin hokarên din yên teybet bi wê ve girêdayine, nahêlin ev daxwazî pêk werê.

**Armanç:** Helwesta partiya we li hember şerê birakujîyê çîbû? Bi dîtina we, sebebê vî şerî çî bû?

**İsmail Emo:** Bê guman em li dijî birakujîyê ne, ji ber ku di nerîna me de, ev bixwe nemana mirovê Kurd bi xwe re tîne. Partiya me di destpêkê de ev karê han riswa kir, û dawa rawestandina şer û danûstandineke aşîti ji bo çareserkirina nakokîyan ku di koka xwe de ev nakokî dîrokî ne, kir. Ev şerê wan rê dide ku dewletên ku Kurd xistine bin destê xwe li herême planên xwe bi cih bînin.

## JI GERNAMEYA MARCO POLO 6 Li Asyayê

Wergêr ji Swêdî: Mihemed Behsiwar

Dema ew hatin vî bajarî zarûk hatibû dinyê û ji her sê qralan pêşî yê salên wî piçûk çû hundir. Ewî zarûk bi her awayî di temenê xwe de dît. Ew gelek şaş û ecêbmayî ji wir derket. Piştî qralê jê mezintir ket hundir, ewî jî zarûk bi her awayî di temenê xwe de dît. Ew jî şaş û ecêbmayî û zû ji wir derket. Dawiyê yê herî mezintir ket hundir û ewî jî zarûk di temenê xwe de dît û bi wî awayî derket derva. Dema her sê gihîştin hev û tiştên ku dîtine ji hev re gotin heyîrî man. Hingê ewana biryar da ku ew dê her sê bi hev re têkevin hundir û li ber destên wî tobe bikin. Çaxê ku ew her sê bi hev re ketin hundir, zarûk 13 salî dît. Ewan li ber destê wî tobe kirin û zêr, bixûr û miskê dane wî; zarûk jî qutîyeke dev girtî da wan. Piştî vê yekê her sê qral derketin rê ku vegevin welatê xwe.

Piştî ku ew rîya çend rojan meşîyan, bi hev re xebardan û biryar dan ku hin bibin ka kurik çî daye wan. Qutîyê vekirin û di nav de kevîrek dît. Piştî vê yekê ew ji ber dîyarîya kurik gelek ecêbmayî man û ji hev pîrsîn ka dê çî maneya ve hebe. Mane ev bû; dema ewan her sê dîyarîyên xwe pêşkêşî kurik kirin û ewî jî wan girt, her sê qralan di dilê xwe de gotin ku ew kurik xwedayê heq e, qralê heq e û merivê heq e. Ew gihîştibûn wê bawerîyeke wisan ku ew bawerî li cem wan bişkuffî, şîn bû; lê pêwîst bû ku wisa hişk bibe, bibe wek kevîr. Û ji bo vî fikrê kurik kevîr da wan, ji ber ku ew î jî van fikrên wan zanibû. Lê ji ber ku her sê qralan bi temamî wê maneya beyankirî fam nekirin, kevîr avêtin bîrekê. Û hima pêre jî ji jor ve agir hat xwarê, ser wê bîra ku kevîr hatibû avêtinê.

Çaxê her sê qralan vê yekê dît, pir tirsîyan û gelek poşman bûn ku wî kevîrî avêtine. Ewana hê wê çaxê têngîştin ku maneyek wî kevîrî ya miqeddes hebû. Hinek ji wî agirî bi xwe re birin welatê xwe, birin dêreke gelek zengîn û sipehî. Agir li wirê jî bo demek dûr û dirêj wek îlahîyek hat xweyî kirin û hemû qurbanên ku dihatin wirê bi vî agirî dihatin pêxistin. Ger ew agir hinek qels bibûna yan jî bihatina tefandin, dê keşîş biçûna bajarên din ên nêzik ku li wir kesên di wê bawerîyê de hebûn û ji wir agir bibirna dêra xwe. Û ji bo vê yekê ewana karibûn gelek caran biçûna rîya deh rojan dîr ji bo ku ji xwe re agir peydaikin. Sebebê ku xelqê vê heremê agir dihebînin ev e.

Xelqê serayê ji Marco Polo re wiha digotin û jê re sond dixwarin ku gotinên wan rast bûn. Û yek ji van qralan ji bajarê Sabayê, yê din ji Avayê û yê dawî jî ji vî serayê (Kashan) (30) hatibûn vî cihî û bi tevaya xelqê heremê (31) re dia dikirin.

Piştî ku min vî meselê ji we re pêşkêş kir, ez dixwazim niha jî li ser welatên Îranê (Persien) û li ser urf û edetên wan bisekinim.

### Welatên Îranê

Di Îranê de -ku welatekî gelek mezin û fire ye- gelek qalîyet hene. Navên wan bi dorê ev in: Welatê ku pêşî meriv dikeve navê wî Kazvîn (Kasîbîn) e. Yê din ku dikeve aliyê başûr Kurdistan e. Yê sisîyan dikeve aliyê bakur û navê wî Luristan (32) e. Yê çara Soulistan (33), yê pênca Spaan (Îsfahan), ê şeşa Sîras (Şîraz), ê hefta Soncara (34) û yê heştî ji Timocain (35) ku dikeve tixûbê dawî yê Îranê. Ev qalîyetên ku me li jor qala wan kir ji bilî Timocainê -ku ew dikeve bakur nêzî çîheki ku jê re Arbor Secce (36) tê gotin-, tev dikevin başûrê welêt.

Ev welat bi hespên xwe yên sipehî û kes nedîtî tê dinasin; gelek hespên vir li Hindê bi bihayekî pir mezin tene firotinê. Bihayê hespekî ji van ne kêmi du sed banknotên Tournesîyê ye (37). Her wiha kerên herî mezintirîn û herî delaltirîn jî li vir in û ew bi bihayek ji hespan jî bilindtir tene firotinê. Sebebên wê jî ji ber ku ew rihettir dizên, barên girantir bar dikin û di rojekê de karin ji meşa hesp û qantiran pirtir herin û her wiha ji wan bi tehemultir in. Tacirên ku dixwazin ji heremekê herin yeke din, ji mecbûrî di çolên mezin û bi sîlekan de diçûn. Li van deran kanî ji hev gelek dîr bûn, cîyên avî ku pelek hêşînahî lê hebe kêmi bûn û tacir jî ji mecbûrî di van rîyên dîr û dirêj de diçûn. Ji ber vî jî ewana bi taybetî cahd dikirin ku ji xwe re ji van keran peydaikin. Meşa wan zûtir û êmê wan jî hindiktir bû. Meriv karibû li virê vî karî bi deveyan jî bimeşîndina. Deve kare weke van keran bar barbîke û meriv kare wan bi bihayek hindik jî peydake, lê ew wek keran zû ne diçûn. Tacirên vî heremê hespan dibirin aliyê Kîşê, Hurmuzê û cîhên din yên ber qeraxê Deryaya Hindê ku li wir jî aliyê kesên ku wana dibirin Hindê ve dihatin kirin. Lê ew ji ber germayîya virê -ku germaya welatê wan li sêrekê diçe-, nikaribûn li vir zêde bişînin.

### Têbînî

29) Maneya Kal'ah-î Atashparastan weke ku di tekstê xwe tê nivîsîn e.

30) Ava, li nimreya 27 an mîzeke. (...)

31) Ev bûyera balkêş a di derheqa her sê qralan de 350 sal berî Marco Polo heye û ji aliyê Olshki hatiye nivîsandinê. (...)

32) Luristan welatekî çîyayî ye û dikeve rojavayê Îsfahanê.

33) Soulistan ew welatê ku Schulfî li ser dijîyan. Schulfî xelqekî berê li ser beşekê axa Lurîyan dijîyan û piştre jî ber Lurîyan di sala 1100 an de ji wir revîyan û di nava Xusiztanê û Şîrazê de bi cih bûn.

34) Soncara (ew welatê ku Schawankêr tê de dijîyan) diket başûrê Şîrazê.

35) Tûn û Kaîn du bajarên Xoresanê ne. Navê vî welaftî jî navê her du bajarên.

36) Li nimreya 61 an mîzeke.

37) Heta sala 1796 an jî diravên frensî yên hesin Tournois bû, piştî vî salê bi frank hat guhîrandinê. 80 frank 81 livres tournois dikir.



## Çand û wêje

## Kewbazê kerr û dengvedana dijwar a bazinên taristanê

● Ehmed Huseynî

Na... min jî nêçira qeqeba te nedixwest û ne jî min ha jê hebû ku ez dê pesnê bişkiwîna serhişkiya te, bi perikên rewanbêjiyê, û bi xêzên bilindgoyê li ser bergên werayî yên bîra birîndar û tîndar, nîgar û nemir bikim...

Min digot û tu çavkaniyên şevê ji ber şemala şîşa galigalan vedîşerî...Min digot: Destên te giyanbexş in, mişt awaz û raz in, mişt XAN in, hetav in, mewîj in. Dengê te yê bê terh, yê kovandar, mişt birûsk û olan û pij in.

Lêvên te yên gulreng, yên gulzar û gazindar eger hatin û barîna êşê, mîna terkên canê min, vexwarin û bi dilsozî, bi xemgînî, xwe dan xatirê şekir rêjiya perwana pêldar ya lêvên hişk û bêwar, dê bizanîbin, çendî mirin di bin zimên de, bîste û cegerdar, şîr hatine; oxir û xatirxwestin ji dava rêçên bêgav û bêkutayî, bi hilhatina rojê re, bi ser serê bîranîne de, wek goşiyên kevirînî, ketine û daketine...

...Lavlava derbendên sînga te xwe li dükela erxewanî ya qolinca min, wek reşmarekî, dialand.. û reşeba ku li ber derî û diwaran sêwî mabû, xwe bi ser rihana xewna min de, bi ser gerdana fixana min de, wek dêwekî ji zingarê, diçemand...

Lê min got:

Mirîd bûm...Mirîd im.

Bê reş perde û gulav û xirçe, mirîd im, daristana saw û tirsê bûm, xweşax û hêlîna çûkên pîrsê bûm, di xelwetgira reşban de min hevrêtiya "Goyîn"ekî jandar dikir.

Di himbêza demsoz ya kula te yî çalak de dibûm du-cot.

Min çimenên şewatperest ji nav çivînên genimrengî yên porê te yî berdayî berhev dikirin, û min bejna birînen te bi gaza axînen xwe dipîva, min nisrînen çelmişî li nişivên hinarkên te dihejmartin...

Da ku şev govendgerîna rengê xwe di xwêdana xwelîrengî de ji bîr neke!

Da ku EHRÎMEN dergûşa qedîfeyî ya deşt û zîranan bi gurmegurma simên ziyane zencîr neke!

Da ku mizgîniya kesera te bi ser dîmenên gulgenîma kesera min de nerijê!

Daku pertewa bendemanê bişîrîna te yî êvarane nekuje!

Daklu dest çepelêkî ruswa û sūcdar ronahî û sivikbarana kila te nemije!

Na..., Min nedixwest:

Ku kolan dudil bê sîber û pêjna te bimînin...ku duryanên seferê bîntengî û bêzariya te nebînin..

Ku kevokên bejî zîringîna nameyên te bi sera û berwar û eywanan negihînin.


Kewbaz e... Li ser piştê hespê taristanê, bê piştê wê, wek şerwanekî xweşmêr lê çavriyayî, bê rê xwe dide bargêhên mest û vehesîngêhên mihrbaz yên bê pîr û bê şopevan...Ne radiweste û ne jî şengiya refên qulingan bayê kur diwestine. Ne bi pêdariya xamê haş dibe û ne jî bi dû dengê çeng û camcamkan de ser û kaş dibe..Ne tî dibe û ne jî li pêşberî xweragirtinê birçî dibe.

Kewbaz e... Cema-warekî şahane di qe-dera şêrane de, dereng mayî, çembil şikestî, li ber toza do-jehî, dihevwertê, bê taldeh û bê balpişt di deftera dîroka kewba-zîya xwe de digevize. Geh bê rê ye, geh bê dê ye, li ber pencereyên dirandî yên xewna kevnar, serencam û lawaz ferhenga evrazê kulê ye...

Kewbaz e.. li ber destê jinbavan perwerde bûye. Di niv sirûdan de hînî harmoniya qamçiyên xwîna xwe dibe. Bi zîmanekî neçar hawara xwe digihîne bextê qêrîna xwe, bi hêrs û halanên xwe; xwe bi xwe, nav di xwe dide, hildiperike Kembera asoyên şîniya xwe, hildiperike penda lihevhatî ya pirtûka azarên xwe... Ne firyadekê dixwe û ne fermanekê vedixwe. Bi kotekî, bi bertekî, bi deki, barana xwe, ji temên matmayîne û ji guhanên ewrên dilsariya me, dadixîne...

Bê dildan, bê tembîname, sava berê xwe dide rakêşa dilana nê-çîrvanan... pûtperest e, ne li xwe ewle dibe û ne jî li bendên rizgayî kevgirtî yên amajeya hebûna me yî ku di nav xirecira ebriwên xewna şevpestance de serûbin dibe...

Lê em dê xwe bi xwe xwe bilorînin ey kewbazê xewnzan.



Wek ku çawan mêkewên hingora teng qeqeb û darêjgehên nêçîrê ji nermabarana memikên te d i d i z î n

wek ku çawan Tawisên reng afsanewî di hilm û wexma seqayên te de d i b e z î n

wek ku çawan dendikên evîna gawirane di ziryana regezperest de zuha dibûn û çêregehên tenhatiyê di şîrikê dîroka pûç de d i r z î n

wek ku çawan zingezinga tîp û xezên Zendavista agirtoza Medya, ew porkura ji kurtepişt Key-xisro û kapeka baskan li jêr guharên giriyana te d i l e r i z î n

wek ku çawan îstgehên berû û şengebiyan serjêkirinên nimêj û kavilkirina terh û bişkojên zer hirmiyên ji sistegavên mehîna te yî piştîsikestî û nûçeyên mirina rewan d i p e n g i z î n


wek ku çawan hinarkên heyvane yên bihivên çiyayên mêşinî ebrû û reşbijankên narîn yên co û cobar-an

gezo, belalûk û gulhinar gulwaz û miştax û evînbaz kesax û giya û elûc simaq û paq û baq di guveguya reşeba û wêranan de di kedîbûna gerravên ceng û hêranan de d i k e r i z î n

wek ku çawan parsû û movikên nihâl û geliyan çen û algûşkên berpâl û zevîyan li ber sergêj-pêlên jehra kitûpir d i d e r i z î n.

EBDULHELÎM YÛSIV:

”Çîrokên min tevî ku bi Erebi hatine nivîsandin, ji wêjeya Kurdî ne”



Ebdulhelîm Yusiv: "Çîrokên min bi Erebi hatine nivîsandin lê giyan û çêj û bîn û cîhan û dîmen û sîmayên wan ji çîroka Erebi cihê ne".

Pirs: Wek nivîskarekî Kurd di nivîsandina Erebi de ku bareyê xwedî xuristêke cihê ye tu xwe li kuderê dibînî, ma gelo di vir de nakokiyek peyda dibe?

Bersiv: A nuha diyardeyek wêjeyî ku dest bi çêkirinê dike, peyda bûye. Mebesta min diyardeya wêjeya Kurdî ya ku bi Erebi hatiye nivîsandin e ku di cîhana wêjeya Kurdî de ji ber sedemên naskirî ronitir diyar dibe. Reng e ezmûneya Selîm BEREKAT ya dahênane (pexşana wî bi taybetî) di vî warî de serkêşanê dike. Hê jî bi xweparastinê ez herdû romanên wî "Hozanên Taristanê" û "Perîk" di çarçewa romana Erebi de dihejmêrim, ev jî, ji ber taybetmendîya bêhempa ya ku van herdû romanên balkêş bi gewde dike. Romana Selîm BEREKAT romanek Kurdî ye bi Erebi hatiye nivîsandin.

Ez bawer im ku ev diyarde dê gelek pirsan û pirsgerêkan ji dayik bike, wek nimûne va hûn dibînin ku pirsgerêkên wêjeya Cezairî ya bi Firanî nivîsandî hê jî li dar in digel ku 30 sal di ser serbixwebûna Cezairê re derbas bûye.

Ez dibînim ku çîrokên min bi Erebi hatine nivîsandin, lê giyan û çêj û bîn û cîhan û dîmen û sîmayên wan ji çîroka Erebi cihê ne, digel ku ji destkeftinên teknîka wê sîdê werdigrin jî. Ev jî alîkariyê dike ku nivîsandina min taybetmendiyêke hilbijarte bi dest xîne ku çîroka Erebi dolmentir bike û gelek tiştan lê zêde bike. Herweha edebiyata Erebi bi ezmûneyên nivîsandina ku xawen

bîn û çêjêke hunerîyaneyî taybetmend ber fireh dike.

Pirs: Piraniya qehremanên çîrokên te bi Kurdî diramin û bi Kurdî xewnan dibînin û bi Kurdî dipeyivin, ma gelo, di wexta nivîsandinê de dema ku tu wan kesan bi Erebi didî peyivin, tu xwe di astengekê de nabînî û bandora wergerandinê li giyanê kesayetiye çî ye?

Bersiv: Pêwîst e bê go-tin ku, nivîsandina ku bareyên Kurdî bi awakî çîrokane pêk tînin, pêdiviyî şî-yaneke duqat e, nivîskarekî Erebi yê ku bi zîmanê xwe yî zikmakî dinivîsîne pê-

wistî vê şîyanê nabe. Ji bilî nave-roka giyanî ya zîmanê ra radên wê yên pisikoloji li vir, wergerandina ku di wexta nivîsandina deqê çîrokê de wek kirinekê, xwe eşkere dike. Tiştê herî zor wergerandina diyaloga di navbera kesan de ye, çawan mirov wê diyalogê wergerîne bêyî ku dilsojiya xwe li beramber seqayên gelêrî û cudawaziyên civakî yên taybetmend winda bike.

Eger nivîskarekî Erebi, derbasî pirsgerêka bikaranîna zîmanê nivîskî yan ê devkî bûye; yan jî di diyalogê de zîmanê siyemîn, em bixwe derbasî hundirê pirsgerê-keke aloztir bûne.

Min bi xwe di nivîsinên xwe de hewl daye ku ez zîmanekî taybet di vî warî de biafirînim.

Zîmanek ber bi taybetmendîya derbirîna Kurdî ve diçe; hewl dide ku xwe dîrî lawaziya wergerandinê çî di zîmanê kesan de be û çî jî di vebêjiyê de be, bixîne.

Ji xwe carina mirov dikare hin hevokan bi awakî tîpane wergerîne; eger ev wergerandin erka hunerî ya zîman pêk bîne; bo eşkerekirina veşartekên mirov û cîhanên wî yên hundirînî. Di çîrokên de, kesên min, bi destpakî ligel zîmanên xwe yî Kurdî danûstandinê dikin. Lê ez bi xwe naxwazim ku ji bilî zîmanên xwe bipeyivin. Çinkî giyan nayê wergerandin lê tiştê ku têt guhez-tin çarçewa giyan e. Deq bi giştî wergerandineke hunerîyane ye bo cîhanêke cihêwaz.

Amadekar:  
Loqman Dêrikî

\*\*\*

\*\*\*

(Dûmahikî dijî hejmarê bê de)



MÜRÎ

■ Nizar Agiri



Gava ez giham ber derî pir westiyayî bûm û min hêskir ku ezê gêj bibim û bikevim. Bi nermî min derî vekir. Dêya min li salonê bû, wek ku li bende min be. Çavên wê bi tirs bûn. Min peyalek av jê xwest, bi lez çû. Bê ku peyvekê bêje. Ez çûm oda xwe, min xwe avêt ser text. Li ser masê rojnama do hebû. Bi herdû destan min rahîştê û di ser serê xwe re girt. "Bi saya Rêderê mezin welat pêşve diçe." "Hêzên nediyar mirovan dikujin." Min di dilê xwe de got: Xelk wek mûriyan dimirin, ji nişkêve tîpên rojname bûn wek komek mûrî û li ber çavên min çûn û hatin. Di cîh de qurincokêk li qirika min ket. Çaxê min destê xwe danî ser cîhê êşê mûriyek piçûk mezeloqî

ket nav tiliyên min. Laşê wê dût bû, di biriqand wek ku rûnkirî be. Min rojname danî aliyekî. Ez rabûm ser piyan. Mûrî di nav tiliyên min de lebat dikir, li ber xwe dida. Min xwest ez wê di pencerê re biavêjim. Wê deqê min mûriyek din li qiraxa text dît, ber bi min dihat. Li pey wê yek din xuya kir. Min xwe nizim kir, li erdê werîsekî reş, dirêj, zirav ji mûriyan ber bi text dihat û pêve hildikişiya dîtema wan xweşik bû. Lê bihnek genî ji wan dihat. - Ev îş wa naqede. Min got. Ez çûm ku melkesê bînim û wan rêj bikim. Çaxa min derî vekir ez bi tirs paşde vegeyriyam. Hundir tev bi xêzên reş yên mûriyan hatibû xemilandin. Hemû bi lez ber bi oda min dihatin. Salon

tîjî bûbû,hiç cihekî vala nemabû. Rûyê erdê reş bûbû, cîh tunebû ku ez lingên xwe deynim. Tev ji aliyê deriyê derve dihatin. Wextê min dest pê kir û meşiyam dengê pelixandina wan di bin sola min de dihat. Ez ber bi deriyê derve çûm, hawîr dorî salonê ji mûriyan hatibû veşartin. Min hest kir ku kesek li pişt derî rawestiyaye. - Dixwaze derî veke? Hêzên ne diyar in? Min xwe bê deng kir û bi aramî nefes çikiyayî destê xwe danî ser destikê derî, hêdî min ew zîvirand. Derî bi sistî ji xwe ber vebû. - Dixwazin min bikujin?

Min serê xwe derxist derve rêzên bê dawî ji mûriyan bi ser hevdû de diketin. Bi derî û dîwaran ve hildikişiyam. Wek lehiyek ji mûriyan li me rabe, lehiyek bilind û nizm dibû wek pêlên avê. Dengêkî pistpistî ji wan dihat. Mûriyan dest pê kiribûn û bi lez rîya oda min girtibûn. Sal-

on tîjî bûbû. Rûbarek ji qîrê diherikî. Min da nav wan û çûm odê. Ode dagirtî bû, her der mûrî bû. Li erdê, li dîwaran, li qaça, li penceran, li ser text, li ser masê. Ez di cîhê xwe de mat û hişk bûm. Min rojname dît, tîpên wê rabûbûn û ketibûn nav refên mûriyan. Peyva "Rêder" bûbû mûriyekî mezin bihnek pir genî jê dihat. Rojname bi xêzên mûriyan re ditewiya mûrî ji ban dihatin xwar, cilên min reş bûbûn. Mûrî bi rêz bi min ve hildikişiyam, hêdî hêdî hemû laşê min bû mûrî. Min kir qîrîn, dengê dêya min bi zor hat. - Ez ji te re avê... Lê min nema tiştêk bihîst. Ez di bin mûriyan de dixeniqîm.

# Rexne, rexnegirî û Dr. Misto Masto

●Suleyman Demir

Seranserê dîroka mirovan di derheqa her babet avakirin û serketinên xwe de ji xwe re gotiye, "ev wilo, ne gelekî baş e, ger em vê derê wilo bikin wê baştir bibe; lewra pêwîstî pê heye". Ev rexneyek e, ev pêwîstiyek e.

Rexne yek ji sedemên lebata her babet pêşketinê ye. Rexne yek ji sedemên serketina mirovan a dîrokî ye. Heger mirov helwesta xwe a rexnegir terk bikin, pêşketin ji radiwest in. Loma ji "terkirina" helwesta rexnegirî him ne tiştêkî pêşverû ye û him jî ne gengaz e. Bi gotineke din, mirov, tu caran bi pêşketin û serketinên xwe qalî nebûne, her xwestine ku baştir û pirtir bikin. Qalbûn ne tiştêkî di destê mirovan de ye, pêwîstî pirtir dibin û pêwîstî hesaniyeke mezintir dixwaze. Mirov dixwaze serketinên xwe bibertir bikin, ji hêla estetîkî de bedewtir bikin. Loma ji mirovan her dem bi çavekî rexnegirî li pêşketina roja xwe nerîne û xwestine pêşdetir bibin. Xwestina dîtina "qusûran" û hewldana çareserkinê, helwesta mirovan a dîrokî ye û tiştêkî pêşverû ye. Ev ji bo hemû hêlên jiyane wilo ye.

Afirandina berhemên edebî û hunermendî, hêlêka jiyane a din e; a estetîk e. Pêşketina di vê hêlê de, serketina di karê organîzekirin û xemilandina temayê de ye. Hunermendê ku karibe vê bike û malzemê xwe efektîf bi kar bîne, serketî ye.

Dema nivîskarek pirtûkekê ya xwe ji karekî din ji xwendevanan re eşkere bike, ya ji hunermendekî din berhemekê din biafrîne û eşkere bike, mirov rexneyan li karê wî ya jî li berhemê wî digire. Ev adeteke baş e. Ji bo ku di vî warî de pêşketin karibe bibe, ji bo baştir karibe bê avakirin û nivîsandin, divê mirov rexne bike. Rexnegirtin, him pêwîst e him jî vatînî ye. Lê rexnegirtin ne redkirin û îdamkirina hunermend û berhemê ye. Rexnegirtin, ji ber ku di rastiya xwe de xwe-diya roleke dîrokî a pêşketinê ye, karekî bi rûmet e. Karên bi rûmet jî, hew dema mirov ji qada rûmetê derveke dikarin bîn kirin. Loma ji rexnegirtin, karekî hasas e. Rexnegirtin ne azadiya di derheqê mirovan de nivîsandina bi her awayî ye.

Bê guman parastina azadiya nivîsandinê û şikandina sansorê tiştêkî girîng e. Divê em hemû vê yekê biparêzin. Lê divê kovar û rojnameyên Kurdistan, li ser navê azadiya nivîsandinê nebin platforma "anarşî" û bêserûberiya çapemeniyê. Di vî warî de berbirsîyariya redaktor û redaksiyonê gelek e. Berpîrsiyarî ne hew ew e ku nivîs ji hêla rênûsî de ji çapê re bîn amede kirin. Divê redaktor û redaksiyon karibin kerş û tiştên giranbûha ji hevdû cuda bikin û pêşkêşî xwendevanan bikin. Divê karibin encama siyasî, civatî û exleqî a tiştên ku çap bikin, texmîn bikin. Divê texmîn bikin ku nivîsên ku çap dikin çî tesîrê li ser hêvî û moralê xelkê û kesê hedef e, dikin. Divê karibin heq û berpîrsiyariya karê xwe bi kar bînin û bêjin "na ezbenî, em vî nivîsê çap nakin, bi rûpelên rojanama me nakeve". Tiştên negatîv, bi çî navî bîn çapkirin jî, ew û rojnama xwe ji bin berpîrsiyariya siyasî, dîrokî û exlaqî xelas nabin.

Lê hefî e ku redaksiyonên Kurdistan gelek caran bi van vatîniyên xwe ranabin û rê didin tiştên ku dibin sedema bêzariya xwendevanan. Di çapemeniya Kurdistan de ji zirt û tehdîtên gangsterî bigrin, heta bi gotinên wek "dizî", "sûtalên kuçan", "biriqandina serê Xelîl Dihokî" û hwd. derdikevin. Bê guman dema mirov van tiştan dixwîne, mirov wek Kurd, wek xwendevan û him jî wek mirov bêzar dibe. Min bi xwe tu caran nexwestiyê xwe tevli van babetên pevçûnan bikim. Bêzarî ye. Lê caran divê mirov raya xwe ji rojnamevan û nivîskar re eşkere bike û ji wan bixwaze ku ji bedelê van tiştên şaş, me fêrî metod û ramanên baştir bikin.

Rexnegirtina di warê edebî de, ne karê redkirinê ya ji pesinandinê tenê ye; eşkerekirina hêlên serketî û kemasiyan in. Dema mirov berhemekê rexne dike, meriv nerxekî hunermendî li berhemê dike. Peyayê rexnegir li hember xwediyê berhemê, bêtarafiya xwe diparêze. Mirov nikare şiklê xelkê yê biyolojîk û şexsiyeta wan wek tema bi kar bîne. Divê ciddiyet û giramiya mirovan di akrê rexnegirî de hebe. Şiklê porê xelkê, hindikbûna porê xelkê, azadiya xelkê ya hilibijartina hevalên rojane û her babet karên legal ku ji

bo debara xwe ya aborî dikin, nikarin bibin tema rexnegiriya lîteratûrî. Ez meraq dikim bê Dr. Misto Masto çawa xuya dike. Gelo tu tiştêkî ku hinek din karibin di derheqê wî de bêjin tune ye? Dr. Misto Masto wek nivîskar van vatîniyan nayne çî, lê min hêvî dikir ku qet nebe wek doktor têbigihêje ku weşandina porê xelkê nikare ji wan re wek qusûr bê dîtin.

Hinek Kurdistan ji zû de bi Kurdî nivîsîne. Berhemên delal ji me re hiştine. Lê li Bakurê Kurdistanê palûta nivîsandina bi Kurdî ne zû de rabûya. Ên ku dest pê kirine hin piraniya wan sax in. Bi salan e ev çend kes, hew ji bo ku çend sed xwendevanên ku hene li xwe zêdetir bikin, dinivîsinin, lê hin ji Kurdî di warê xwendina Kurdî de, hêviyên mirovan xurtir nakin. Ev yek bi xwe jî sedemek e ku nivîskariya Kurdistan pêşnekeve ye. Di rewşeke wilo de, bê guman J. London, M. Gorkî, Dostoyevskî, Mayakovskî û Şolohov ji nav nivîskarên Kurdistan dernakevin. Ji bo derkevin divê Kurd salên dirêj antremaneke dijwar bikin.

Mehmed Uzun û Firat Cewerî tev qusûr û kêmasiyên xwe ji nivîskarên Kurd in. Wek hemû nivîskarên Kurdistan hew çend sed xwendevanên wan hene. Mirov nikare wel berhemên Dostoyevskî ji wan bixwaze. Ev neheqî ye. Kurd hîn antremana nivîsandinê dikin. Ev herdû camêr ji beşdarî vî antremanê bûne. Divê ev kar bê kirin. Ger herdû camêr jî dikin, tev qusûrên wan jî, mala wan jî ava. Tu kesan bi destên ên ku dikarin vî karî baştir jî bikin, negirtine.

Bê guman qusûrên nivîskariya wan camêran hene û divê bîn rexnekirin. Lê ji ber vî yekê, mirov nikare wan bi xwe jî bi kêmasiyên wan re li ber avê berde û bixwaze wan bike mahkûmên miletekî. Ev neheqiyêke din e.

Herdû jî hîn ciwan in; hîn wexta wan ku salên dirêj serê xwe bi van karan re biêşînin heye. Pêwîstiya wan bi ew babet rexneyên ku bikin kêmasiyên xwe bibînin û careka din dubare nekin, heye. Divê rexne û rexnegir, ji wan re jî

bi awayekî hemdem alîkar û avakir be.

Lê ez bi rastî bibêjim, min bi xwe tu zimanê lîteratûrî, pîvanên hemdem û avakar di nivîsên Dr. Misto Masto de nedîtin. Ji berê de daye ber xwe û wek êgir lê çûye. Ne serî heye û ne jî binî. Tu derve girîne û rexnekirinê tê de tunene, bêkeys e. Wek karekî ku ji ber betaliyeke mezin bûye, xuya dike. Komediyeke amator û tu xizmetê ji rexnegirtina zanistî re nake. Metod, ji entelektueliyê dîr e û estetîkeke lîteratûrî tê de tune. Dema min nivîs hemû xwend, tiştê ku ji min re got, ev e: ez ê F. Cewerî û M. Uzun rezil bikim, ez ê çira wan a nivîskari vewirînim! Ji bo vî yekê, çî pêwîst be ez ê bêjim. Û mixabin wilo gotiye.

Bi baweriya min ev helwesteke ku ji hêla huqûqî de kevnar e û hişk e. Heqê mirov, ku mirov li ser navê heqê xwe yê rexnegirtinê, hinekên din ji hêla moral de bombardûman bike, tune. Lê ger hinek derkevin û bixwazin tiştên wilo bikin, divê redaktor di kovar û rojnameyên xwe de rê nedin wan.

Dr. Misto Masto xwestiyê gelek tiştan bêje û "rexne" bike. Nêta min ku ez rabim berhem û kirinên M. Uzun û F. Cewerî biparêzim tune. Bila bersiva wan tiştan hemûyan ger gengaz be, ew bi xwe bidin. Lê ez bi xwe wek xwendevanekî di metod û zimanê nivîsê de bêqanûniyekê dibînim. Dema muxatab kes bin, mirov zimanekî nivîskari û hemdem bi kar tîne. Mirov nikare ji tinazan re bêje rexne.

Ger nivîseke wilo, bi navekî erzan ku tu mirov bi xwestina dilê xwe, li xwe nake derkeve, him sedemên ku mirov baweriyê bi nivîsê bîne hindiktir dibin û him jî şikê dibe ser hinekên din jî. Bi baweriya min tradisyonek di pişt wî navî de heye. Wê hew çend kes zanibin bê ew nav, navê kê ye; wê piraniya xwendevanan qet nizanibin. Loma jî derûdora Armançê hemû di bin tawanbariya wî navî de ye.

Ma ne eceb e ku yek radibe F. Cewerî di rûpelên rojnameyekê de dixê bin erdê, lê F. Cewerî nizane bêkî ye. F. Cewerî ne dewletek e, ne General Gallifet

e, tirs ji ber çî ye?

Dr. Misto Masto di dawiya nivîsa duyem de ji Dr. Poloço re dibêje "Gerdûnist" bixwîne. Min jî dîsa xwend lê min tiştêkî nû tede nedît. Tinaz û komedî ne. Lê gor ku min ji nivîsê fahm kir, hewcedariya nivîsa "Gerdûnist" ji ber "hevûdû-pesnandina" M. Uzun û F. Cewerî çêbûye. Xuya ye ku Dr. Misto Masto ji vî yekê pîrr aciz bûye. Lê di hejmara 148 a Armançê de yanî berê hejmara ku "Gerdûnist" tê de çap bûye, Bavê Nazê, Ehmed Huseynî pîrr pesinandiye. Dibêje "pêla ez nivîsên Ehmed Huseynî dixwînim, pêre-pêre ez xwe biçûk dibînim û bêhemdî xwe, ez li ferhenga zanîna xwe vedigerim". Ji ber ku "hin helbest" di diwana wî de "hene ku ewê nema tixûbên corrafî û dîrokî bizanibin". Dibe, ji ber ku Ehmed Huseynî jîr e. Lê Dr. Misto Masto wilo nasekine, ji van tiştan aciz e û serê xwe pê diêşîne, tiştên wilo dibîne. Ez meraq dikim, gelo çima Dr. Misto masto di "Gerdûnist" de qala van gotinan ji nekiriye? Dr. Misto Masto ne xwediyê tu edaletê ye.

Min di derheqa van nivîsan de li hinêk xwendevanên Armançê guhdar kir; ez li kesekî ku ji wan nivîsan memnûn bûn rast nehatim. Ramana hevbeş "Armanç ne ji bo tiştên wilo ye, ew nivîs zêde didin ser F. Cewerî" bû.

Ez dizanim ku Armanç rojnameyêke serbixwe ye. Ev tiştêkî pîrr baş e. Ev, meçela ku Armanç karibe bibe xwediyê şaxsiyeteke qewintir heye. Û ez dizanim ku beşê kulturî jî di Armançê de xwediyê babetekî otonomiyê ye. Ev jî baş e. Lê Armanç, ne bê armanç û bê prensîb e. Heger ku berpîrsiyarê beşê kulturî bi tiştên ku çap dike ji armanç û prensîbên Armançê radixerice, divê redaksiyon alîkariya wî bike.

Ez bawer nakim ku Armanç karibe bi nivîsên wilo fêdeyekê bigihîne xwe û çapemeniya Kurdistan. Ez bawer nakim tiştên ku xwendevan dixwazin di Armançê de bixwînin, dê nivîsên wilo bin. □



# ÇEND MİLQATİKÎ

Arêkerdax: Seyîtxan KURÎJ

Miyûn gelê (şarê) Kurdî di milqatîkî yo cawo girîng gênî. Ma îta di meselûn kilmekûn ra vûnî "milqatîkî". Hêna zaf şarî hêt Çewlîgî (Bingolî) vûnû "milqatîk". Milqatîkûn ra Tirkî merdim eşkenû vacû "fikra". Miyûn edebiyatî fekkî yê gelê Kurdî di sonik û deyrûn het di cayî milqatîkûn zi girîng û. Qêdo (qeydo) ki yenû zûnayîş lehça Zazakî zaf kemî ameya nuştîş. Inay ra gel cuyayîşî (heyatî) xwi, zûnayê xwi, tecrubê henzar serrûn, fikrî xwi pê milqatîkûn ardî zûn. Çimkî pê milqatîkûn gurê xelêt, xayînê, bêbextê yêni rexnekerdiş. Her gel gorê xwi qêdê cuyayîşî xwi esto. Gel holê û xirabê, raştîyê û xeletîyî tecrubê cuyayîşî xwi ra veceno. Inî qaydê kitabûn di nuşte nî, la miyûn gelî di sê qanun î. Milqatîkûn di biyayê hêna zêd bînatê heywûnûn û insûnûn di, bînatê heywûnûn û heywûnûn di vêriyênî. Îta di heywûnî sembol î, esas yenû a me'na ki "Diyeso to rî vûna, vêvê ti bieşnawî".

## MAR Û LUY

Demûnî serr ra vera wusarî yo. Yo luy şina yo verrojîki di qeldiyena ra (qelibiyena) ra, xwi dûna ver tîj.

Ya ha owca di raqeldiyayî, henda vîna ki yo mar hûn û miyûn yo belek vori d' o. Mar ha gûnî ver d' o, hin-hina ki bimirû. Merhemet kwen luy zerre, wazena marî bixelisnû. Luy marî piyeşena xwi mil a û şina tîj ver a qeldiyena ra. Tîj dûna marî ri, gûn yenû marî, wi yenû xwi. Mar ki yenû xwi, qirikê luy di luefûnî xwi kenû pît (pêt), luy qefilnenû.

Luy vûna: -Maro bira, ti hê y se kenî?

Mar vûnû: -Ez tu xeniqnena.

Luy vûna: -Suci mi çi û? Mi tu ri yo xirabê kerdî? Ti qê mi xeniqnenî?

Mar vûnû: -Suci tu çinû, la ez ca ra tu kişena.

Luy vûna: -La ti yo firsend mi nidûnî?

Mar vûnû: -Ti eşkena wesîyêti xwi yî pêyin bikirî.

Luy vûna: -Wesîyêti mi wo pêyin owi ku ez aşiqay a qirikê tu ya rind biya. Ez wazena qirikê tu rind a temaşe bikirî. Milî xwi derg kir, ez rind a biunî a qirikê tu ya rind a.

Mar qirikê xwi kenû derg, ûnû verî feki luy. Luy zît bena qirikê marî tepişena, kena pît. Mar biye nefes mûnenû û mirenu.

Luy biyeçê marî tepişena, yi 'erd ser o kena derg, kena raşt se tîr û durî ra vindena uniyena marî ra, vûna:

-Biratê ri raştîyê lazim a, biratê di bêbextê nibena!

## LUY Û CİTIYER

Yo zemûnî di yo luy û yo citiyer benî way û biray. Luy citiyerî ri zaf holê kena. Tim û tim yi ri xeberûn ûna.

Îni demi di yo heş musawû querîyêk. Citiyer tim û tim yenû ki heş querîyêk yi telef kerdû. Citiyer kutikûn benû yegay (hêgay) ver, merdimûnî çekdarûn benû, la taway pere nikenû. Wi mecbur mûnenû hêna şinû luy het. Luy ra vûnû:

-Wayê, yo heş musawû querîyêk ma, yêgay ma ya taway niverda, ma îni ra sinî bixelisim?

Luy vûna: -Birawo, ez siba yo gezi kena biyeçê xwi ya, dûmara yegay şina-yena, toz-dumûn verdena îtawûn ser. Ti pers bikir vaci "Çi û, se bû?" Ez vûna "La mîrî welatî niweş kotû, hekîmî amê ser, vatû dermûnî niweşî yi dimê heş û; kûmca yo heş ame vînayîş, gerek bîyerû kiştîş û dimê yi bîyerû tirakerdiş."

Rueja bîn sêrsibay luy yena 'eynî o qêde kena. Der-cîrûn yenî piye ser, persenî vûnî:

-Çita wû, se bû?

Luy vûna: -Hayloo, mepersiyên! Mîrî welatî niweş kotû, darî derdî yi dimê heş o. Gere kûm ca yo heş estû, bîyerû kiştîş.

Heş veng luy eşnawenû. Luy cuwa pê hêt heş a şina, heş vûnû:

-Wayê, o çi û ti vûna?

Luy vûna birawo, mepers, hal-hewal ûna wû.

Heş vûnû: -Ez se bikirî?

Luy vûna: -Bîye ina çal kuri, ez kerrûn dûna tû ser, tû nimnena.

Heş vûnû: -Wa bû.

Heş kwenû zerrê çal, luy kerrûn dûna yi ser, wi binî kerrûn di mûnenû.

Heş bin ra qêrrenû: -Wayê, caykê mi aysenû?

Luy vûna: -Gueşî (goşî) tû aysenî.

Heş vûnû: -Gueşûnî mi tira kiri.

Luy gueşûnî heşî tira kena.

Heş vûnû: -Caykê mi aysenû?

Luy vûna: -Destî tû aysenî.

Heş vûnû: -Destûnî mi tira kiri.

Ya destûnî yî tira kena.

Wi hêna vûnû: -Hama caykê mi aysenû?

Ya vûna: -Lingî tû aysenî.

Wi vûnû: -Lingûnî mi tira kiri.

Ya lingûnî yî tira kena.

Wi hûnc (ancî) veng dûnû:

-Caykê mi teber a mend?

Ya vûna: -Sarê tû mend.

Wi vûnû: -Sarê mi zi tira kiri.

Lu sarê heşî zi tira kena, citiyer heşî ra xelisîyenû.

Citiyer luy ra vûnû: -Wayê tû ma ri zaf holê kerd, ez wazena ki siba tû de'wet bikirî.

Luy vûna: -Taway nibenû, ez siba sêrsibay yena.

Rueja bîn citiyer xelatê luy kenû hedre û genû şinû luy het.

Citiyer perro bîn ra zi yo tûnzî kenû yo çuwal, erzenû binî

# FERHENGÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ

## Malmîsanij

| Kirdkî (Zazakî)               | Pehlewî (*)                             | Kurmanckî                            |
|-------------------------------|---|--------------------------------------|
| acêr, war, diwar              | ezêr, eder, fro, fru                    | jêr, xwar                            |
| adir                          | ater, atur, ateş                        | agir                                 |
| akerdiş, wekerdene            | epaç kerten                             | vekirin                              |
| alingî                        | aleg                                    | alûçe, hulîzerk                      |
| amver                         | hemver                                  | hember                               |
| ameyîne/amayene               | ameten                                  | hatin                                |
| amnan, aminan                 | hamin, hamên                            | havîn                                |
| amnani, aminani               | haminik, hamênik                        | havîni                               |
| amore, hûmari                 | amar, hemar, oşmar, mer, merék, marîk   | hejmar, jimar                        |
| amordiş, hûmaritiş            | hemarişn, marişn, aşmarişnih, oşmurişn  | hejmartin                            |
| amordox, hûmaritox            | amarênîter, mardar                      | kesê ku dihejmêre                    |
| amordene/hûmaritiş            | amarênîten/hemarenîten/amarten/uşmurtên | hejmartin/jimartin                   |
| -an                           | -an                                     | -an                                  |
| antiş, kaş kerdîş             | hencîten, axten                         | kişandin                             |
| apey geyrayîş, agêrayîş       | epaç vertîten                           | paşda vegerîn, vegerîn               |
| ara, veyşan, vêşan            | esûr, guşnek                            | birçî, birsî                         |
| arayî, arî, vêşani            | exwertarîh, gursnegîh                   | birçîti, birsîti                     |
| ard                           | ard                                     | ard, arvan                           |
| ardim, yardım                 | adiyaromendih                           | ardim, yardim, alîkarî               |
| arê, ayre, arriş              | asiya                                   | aş                                   |
| argûş, argoş, hargûş, arwêş   | xergoş                                  | kerguh, kêrguh, kêrwîşk              |
| arrisayîş                     | asanênîten                              | arîmin, hêsa bûn, vehesîyan, vêsîyan |
| asan                          | asan                                    | hêsan, asan                          |
| asani, asaney                 | asanih                                  | hêsanî, asanî                        |
| asayîş, hasayîş               | sehîşn                                  | xûya bûn, xûya kirin                 |
| asin                          | asên, ahên                              | hesin, asin                          |
| asinîn, asinên                | asênên, ahênîn                          | hesinî                               |
| asinker, kureçî               | asênker, asinger                        | hesinker, hesingêr, kûrevan          |
| asmên, asmîn                  | asman/esman                             | asîman/asman/esman/ezman             |
| asnawe, esnawi                | şnaç                                    | ajne                                 |
| aşkawiyyîş/eşkawiyyayîş/vîşko | dayîş/abiyyayîş                         | vişkoften/vîşkoften/şkoften          |
| aştî                          | aştîh                                   | bişkavtin/bîşkivîn                   |
| aştî dayox                    | aştîh datar                             | aştî                                 |
| aw, ewe, we, wi, o, yû        | han, ho                                 | yê ku aştî dide ew                   |
| awre, awri                    | apusiş, apurak                          | avis                                 |
| awr kerdîş                    | gewr kerten                             | avis kirin                           |
| awî                           | apik                                    | avî                                  |
| axur, gow, gewi               | axver, goband                           | axur, gov, gom                       |
| ayşmi, aşme, aşmi, mence      | ayîşm, mah                              | meh                                  |

\*Kelîmeyê Pehlewîkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Fereveşî, Ferhengê Pehlevî

çeng xwi.

Lu weta yena, la tûnzî vîna. Citiyer vûnû: -Wayê, bîye xelatê xwi bigîr.

Ya vûna: -Bira, xelatê mi oca di ruen û ti şue, ez yena gena.

Citiyer çarmenû niçarmenû nişkenû luy bixapînû. Uniyenû ki ûna nibenû, tûnzî verra dînu. Luy remena, tûnzî kwena dim a.

Luy remena şina miyûn yo kerrî di xwi nimnena. Ya qefliyaya, xilik-bilik ra kota. Kiştûn dûna xwi ri, vûna:

-Ço çinû yo zuape (zope) bigîrû mi bikişû bikişû? Ez qê citiyerî ri hole bikîr ki wi zi ûna bikir mi!

A hel yo şûne ho oca di pes çirnenû. Şûne vengî luy eşnawenû, yo çue genû û pê yo dest a biyeçê luy tepişenû, xêliyek dînu luyi ri. Sinî benû luy xwi yî dest ra xelisnena, remena şina şikêf yo kerrî di binê arrisiyena û xwi bi xwi vûna:

-Ne'let bîyerû inî zemûnî! Ço niftûnû xwi ri yo qal bikirû.

## MAR Û 'ELÎ

Rojêk yo merdim ho riye ra şinû, yo cawo serdini di, cawo owkini (awkini) di raştî yo marî yenû. Nûmê inî merdimî 'Elî yû. Gunekê 'Elî marî yena, wi marî piyeşenû xwi ya û şinû yo verrojîki di qeldiyenû ra.

Îta tîj dûna marî ri, benû germin. Ki benû germin gûn yenû marî. Wi sê hê vêr benû xişt û dasî vecenû, 'Elî ra vûnû:

-Ez gereka tu bikişî.

'Elî vûnû: -Ti qê mi kişenî?

Mi tu merg ra xelisna. Mar vûnû: -Ti benîadem î, şima duşmenî min î; ez tu kişena.

'Elî vûnû: -Ma şimi şer'at?

Mar vûnû: -Ma şimi.

Mar û 'Elî şinî yo derê owk (awk) ver. 'Elî owk ra vûnû hal-hewal ûna, mi ini mar merg ra xelisna, wi zi wazenû mi bikişû. Ti vûna se?

Owk vûna: -Wa tu bikişû. Ez ehend pak a, temîz a la hûnc şima xatirî mi nizûnî. Şima mi kenî

lêmin, şima çi pîsî erzenî zerrê mi. Ti marî ri holê kenî wa tu bikişû.

Yî hêna şinî, raştî yo luy yenî. 'Elî luy ra vûnû wayê, hal-hewal mar ûna wû. Wi wazenû mi bikişû. Ti ma ri şer'at bikir.

Luy vûna: -Ez şima ri şer'at kena, la yo tenî ri şer'at nibenû. Semedî şer'atkerdiş a di tenî lazim î. Şima inkê yo ten î, şima gereka ciye ser bikurî. Wa mar tu verra dû û şuwer dur, ez o waxt şima ri şer'at kena.

Mar 'Elî verra dînu û şinû dur. Luy vûna:

-'Elî, owî çi û ho wetî d' o? 'Elî vûn: -Mar û.

Ya vûna: -La owî ko ho tu ver a çi û?

Wi vûnû: -Kalm[e] o.

Ya vûna: -De pirîye di marî bikişî! Mar biyeitûbar û, itûbarê marî nibena.

'Elî pê kalmî ya dînu marî ri, yi kişenû û tira xelisîyenû.



# Seyehata min bo Kurdistanê

## ● Hesen Mezin

Havîna 1992 bi heyecaneke kûr û hisên tevlihev min berê xwe da ber bi rojhilata navîn ku piştî 15 sal welatê xwe ziyaret bikim. 15 sal ji welêt dûrketim ne hewqasî hesan e. Heyecana dîtina mirov dost û hevalan hîn ku seyheta 5 rojên wek rojek derbas dibe. Ez vê heyecana xwe li vir ne hewce ye îzah bikim. Ew hesên ku wek min ji welêt bi salan dûr ketine vê heyecanê ji nêz ve dinasin.

Dema otobosa Diyarbekirê ji termînalê Mersînê hereket kir, şofêrê otobosê kaseta dengbêjê hêja şivan xiste teyibê û dengê hozanê bi nav û deng, bilbilê gelê Kurd, heyecana min bilindtir kir. Girtî dikete dilê min lê çi hikmet bû nizanîm, min dikir nedikir nikaribûm bigirîm. Dema otobosê kete sînora Kurdistanê filma "Rê" ya rejîsorê Kurd Yılmaz Guney di ber çavên min de wek xeyal derbas bû û lewha "Kurdistan" berê

okey (konken) dilistin heya tu bêji pîr bûn. Qahwexaneyên ku lê mamoste û xwendevan rûdiniştin bi kûrahî bi listika qaxiz an jî bi listikê din mijûl bûn.

Kolan û siqaqên Diyarbekirê bêxwedîtîyê xwe pir eşkere dida xuyakirinê. Çopên li ser hev topkirî bêhnek ne xweş dida hawîdorê. Rewşa Diyarbekirê ji havîna sala 1992 heya havîna sala 1994' an hîç ne hatibû guhertinê.

Di vegeerê de min ciyên turîstîk ên li ber Behra Spî ziyaret kir. Tiştê ku bala min dikşand zarokên di navbera 9- 15 salî ku sindoqên xwe yê boya xê li ber wan li teniştê kolanan rûniştî yan jî garisfiroşên 18- 25 salî yê Kurd bûn. Mirov dizanibû ku ew Kurd in. Gelek cara min ji xanima xwe re digot: "binêre ev Kurd e" wê li min vedigerand û digot: "Dê hema tu kî/ kê bibînî Kurd dihesibînî. Min berê xwe dida wan kesan û dest bi Kurdiya xwe ya şêrîn dikir. Texmînen min ez derewîn derne-dixistim. Bersiva wan jî bi Kur-

va wan bi piranî erîni bûn û digotin; "Bila be, ser seran, ser çavan, ma em ne birayên hevdu ne". Lê belê di havîna sala 1994'an de tiştên ku du sal berê me dîtî û jiyan ji holê wenda bûbûn. Di sohbetên min de ên bi dost û hevalan re tengasiya herî mezin zimên bû. Herçiqas min hewl dida ku zimanê Kurdî bibe zimanê sohbetên me lê pîr mixabin he-wildana min tenê pênc deqîqe dajot, me mecbûr disa zimanê xwe dikir Tirkî. Gelek caran jî-herçiqas ez heya ji min tê Kurmanciyek sivik dipeyivim jî- dost û hevalan ji min re digotin; "Tu bi Xwedê kî bi Tirkî bipeyive, heyran Kurmanciya me têra sohbetê nake".

Feqiriya dost û hevalan ne tenê ji aliyê zimên bû. Di sohbetên babetên siyasî de jî piştî pênc-şeş deqîqe xezîna wan diçikiya. Sohbet û munaqesê gelek caran diçû û dihat li ser PKK'ê radiwestiya. Gava min



Dîmenek ji Diyarbekirê

ketina bajarê Entabê bilind bû. Hêsiyên tijî bêrî û hesret xwe ber bi hinariyên min berdan.

Piştî du salan carekî din min berê xwe da welêt. Ew heyecana min a sala 1992 nemabû. Di seyhata min a sala 1992' an de tirsêk di dilê min de hebû lê vê care-havîna 1994' an- ew tirs nemabû. Cesareta min zehfir bû lê wek cara berê heval, dost û mirovên min nedixwestin ku ez biçim Diyarbekirê û li Diyarbekirê jî wan nedihîşt ku ez bi dilê xwe derkevim der û li bajêr bigerim, dost û hevala bibînim. Tirsê dost, heval û mirovên min ji ya min zehfir bû. Lê belê min herdu caran jî bi ya xwe kir û ne bi têra xwe be jî li bajêr geriyam, hin dost û hevalan ziyaret kirim.

Di havîna sala 1992' an de piştî saet 21<sup>00</sup> ne mimkûn bû ku ez derkevim der. **Herroj bi kêmasî yek-didû kes dihatin kuştin. Dema mirov li dolmîşa siwar dibû qasetên Kurdî li ser bûn, li Baxlêrê, Mêrgehmedê qasetfiroş him li ser cadan him jî li dikanan qasetên Kurdî difrotin. Tiştê ku pir bala min dikşand ew bû ku kesên rojname dixwandin pir kê m bûn. Qehwexaneyên ku min ziyaret dikir tede kesên qaxiz,**

diya şêrîn bû. Piraniya van zarok û xortên Kurda yan jî zulma dewletê yan jî dijitiya navbera Kurda barkiribûn hatibûn welatê xerîbiyê. Lê pîr mixabin di seyhata min a havîna 1994' an de min wan kesên ku bi rehetî texmîn dikir ku Kurd in, nedîtî. Te digot qey xela ketibû nav wan. Min sedema vê yekê ji heval û dostên xwe yê li Antalyayê pirs kir. Bersiva wan: "heyran, bi rastî danûstendinên me bi xelkên din re roj bi roj xirabtir dibin. Bombe-yên ku li van deran tèn teqandin rewşa me xerabtir dibe û em nikarin bi awayek erîni xwe biparêzin. Em Kurd li van deran bûne "terorîst". Her care ku tiştêk diqewime em Kurd dibin hedefa çavnebaran. Zarokên me hew dikarin derkevin der, biçin dibistanê. Dijitiya Kurd û Tirk roj bi roj xurtir dibe. Ya rastî ew e ku him dewlet him jî PKK di vê yekê de rola xwe ya negatîf dileyîzî". Wek tê bîra xwendevanan bi hezaran Kurd li Fethiyeyê, li Alan-yayê û li hin dewerên din yê turîstîk mecbûr man û terka warên xwe kirin.

Di sala 1992'an de ciyên ku em lê diman bivê ne vê me bi Tirkan re danûstendinan dikir. Di sohbetan de me diyar dikir ku em Kurd in û ji Kurdistanê ne. Bersi-

rexne û dîtînen xwe yê siyasî pêşkêşî wan dikir him pê kêf-xweş dibûn him jî tiştêk di çavên wan de diyar dibû û digotin: "Em rica dikin ku tu li her derê weha eşkere nepeyivî".

Di dawîya sohbetên siyasî de gotin dihat li ser alternatîvan. Dema min nêrinên xwe li ser alternatîvan pêşkêşî heval û dostan dikir-nêrinên min li ser alternatîvan di hejmarên berê yê Armançê de hatine pêşkêş kirin- pîrsa wan "ka wê kî vê yekê bi çîh bîne" bû? Xuya bû ku heval û dost hêviya xwe ji derveyî welêt re hiştibûn. Ev yek jî nişana zêfîbûna kadirên siyasî bû.

Dema min heval û dostan li ser kar û xebatên Ewropayê agahdar dikir nedixwestin bawer bikin. Ji wan ve kar û barên ku li Ewropayê tê kirin ji aliyê PKK'ê ve ye, yê din ciyên xwe de rûniştine û tu tiştêk nakin. Ev yek jî nişana tunebûna qanalên agahdariyê bû. Ji ber ku dema min qala partiyên siyasî yê Kurd dikir "Digotin heyran navê wan nahê bistin û ne jî kovar û rojname-yên wan digihîjên destên me" bû. □

## Dûmahîka nivisan

### Kongreya YEKBÛNê

Kongreya duyem a YEKBÛNê dest nişan kir ku; "li Kurdistanê bakur dewleta Tirk bi musirî li ser politîkaya înkâr û qirkirinê berde-wam e û yek ji armançên herî girîng ya vê politîkayê jî bê mirov hiştin û "ji nû ve fetihkirin" a Kurdistanê û bi vî awayî jî berde-wamkirina serdestiya xwe ya li ser wela-tê me ye. Ev rastî bi valakirina bi hezaran gund û mez- rayan, koça bi milyonan Kurd û bi reorganîzekirina hêza şer û tev dezgehên dew- letê xwe xuya dibe". Girtina DEP ê, rakirina umîniteta parlamenterên DEP ê û me- toda "mahkemekirin" wê, hinek nişanên vê bêçaretiyê ne".

Kongreya duyem a YEKBÛNê li ser avakirina ceb- heya Kurdistanê rawest û Platforma Cebheya Netewî û Demokratîk ya Kurdistanê Bakur ya ku wek encameke qonaxa hevkarîya netewî û

diyalogê bi taybetî di Adara 1993 an de dest pê kir, nişan da û politîkaya partiyê ya di vî warî de pejiwand û weha diyar kir; "divê organên partiyê bi aktîfî ji bo nemana baweriyên ku wek "taktîk" li pîrsa cebheye dinêrin, bixeb- itin û tev hêzên netewî di vî warî de hesas û xwedî berpir- siyarî bin".

Di dawîya daxuyaniyê de têtê gotin ku, "li dijî şerê înkâr û qirkirinê Dewleta Tirk, piştigiriya gelê Kurd ê ku ji bo bidestxistina mafên meşrû yê netewî û demok- ratîk têdikoşe wezîfeyêke însanî ye, kongre careke din gazî Netewên Yekgirtî, Kon- feransa Ewlehî û Hevkariya Ewropayê, Parlamentoya Ew- rûpayê û welatên endam û hemû dezgeh û rêxistinên însanî û demokratîk ên li ci- hanê dibe ku di vî warî de hesastir bin".

### Hilbijartin... Destpêk r. 2

tanê hilbijartin bîn boykot kirin, li deverên ku hoyên vê yekê tune- bin, dengên vala bîn bi kar anîn.

Partiya me ji bona ku li der- veyî deverên hilbijartinê yê 13 parlamenterên DEP'ê, siyaseta zulm û zordariya dewletê bê riswa kirin, û ala biratî û dostaniyê bê bilind kirin; hemû aliyên sos- yalîst, şoreşger, demokrat û opo- zisyona li Tirkiyê û Kurdistanê ku li hember pîrsên gelên me he- sas in, gazî hevkarîyê dibe."

**TSK:** "Di vê dema biryara hilbijartinê hat girtin jî di serî de berpîrsên HADEP'ê, yek bi yek endamên wê di encama êrişên çekdarî tèn kuştin, tèn girtin. Ev yek berde-wama politîkayên ku heta nuha tê takîpkirinê ye. Di vê qonaxê de şertên ku HADEP beşdarî hilbijartinan bibe ji holê hatiye rakirin. Jixwe çewa ku bi direktîfên Fermandariya Giştî ji meclîsê avêtina DEP'îyan, ne meşrû bû, ne meşrûbûna ev hilbi- jartina ku tê fikirandin jî li rastî ye û ji ber vê yekê divê hilbijar- tin bê boykotkirin.

**Hevdem:** "Muxalefeta ne- tewî ya Kurd divê şîara ku vê hil- bijartinê meşrû nabîne derxe pêş, bi politîkayêke ku derba 2'yê Ad- arê meşrû nabîne, beşdarî hilbijar- tînan nebe".

**Özgür Halk:** "Ew rejîma ji alî daira Herba Taybetî û Konseya Ewlekarî ya Mîlî tê îdara kirin, wekîlên ku bi îrada azad a gel ha- tine hilbijartin davêje hepsê û di- kuje û welatê me kiriye dojeh. Di vê qonaxê de wekîl şandina meclîseke ku hêza wê ya temsîl û û biryarê tuneye, gaflet e".

**Stêrka Rizgarî:** "Di vê rewşê de ji ber ku em dizanin, bi mana mafhûmê burjuvazî jî şertên asgarî yê hilbijartinan tune, hilbijartin bes ji bo nuhkirina vîtrînê û mekanîzma Şerê Taybetî ye; manawrayeke meşrûkirina direktîfên Konseya Ewlekarî ya Mîlî ye. Divê ev hilbijartin bê redkirin û boykotkirin; divê ko- lonyalîst di nuh kirina "axura" xwe de tenê bê hiştin".

**Jiyana Nû:** "Ji binî de rewşa hilbijartinan tuneye. Rewşa ku hilbijêrên Kurd dengên xwe bi- din tuneye".

**Newroz:** Wek helwest di van şertan de em difikirin ku ji hilbi- jartinê re bibêjin "Na".... Em dibê- jin "avêtina we ya parlamenterên Kurd derveyî meclîsê ne meşrû ye, em nas nakin; ew heta 96'a wekîl in; û ji ber vê yekê hûn nikarin hilbijartîneke derewîn li ser wan ava bikin". Bi a me divê wek sedem ev yek derkeve pêş".

## Qedexkirina Pirtûkan

Wek tê zanîn di 13'ê Tebaxa 1994'an de pirtûkeke Selim Çurukkaya ya bi navê "Aponun Ayetleri" (Ayetên Apo) ji aliyê weşanxaneyê 14 Temmuz ve hatibû çap kirin. Li gor agahdariyên Weşanxaneyê 14 Temmuz li hin wela- tên Ewropayê kesên ku pirtûkê dixwînin, tèn tehdît kirin. Agahdariyên ku weşanxane dide bi kurtî weha ne: Li hin wela- tên Ewropayê kesên ku pirtûka Selim Çurukkaya dixwînin, tèn tehdît kirin. Li Elmanyayê, li bajarê Bremenê kesên ku wek Apoyî tèn nasîn, êriş birine ser çayxaneyekê, sê wela- tperwerên ku ev pirtûk dixwendin birîndar kirine. Birîna yek ji wan Fuat Karaaslan giran e.



# Kultur û Politîka

Riza Polat

## Dawiya 'Enterîtiyê' tune ye!

Şer û têkoşina gelên bindest ya ji bo azadî, heq û huqûqên neteweyî di gelek qonaxên cur be cur re derbas dibe. Destpêka şer û heta azadî bi dest ve tê, xebat û têkoşin ji wek zarokeke piçûk, ewilî dest pê dibe çarlepîya dimeşe û dure radibe ser lingên xwe û pê ve diçe. Zarok heta derûdora xwe nas dibe û têdigihêje gelek caran destê xwe dişewitîne, di-keve, radibe û xwe dêsîne.

Ev tişt hemû ne ji bo ku zarok derûdora xwe nabîne tene serê wî ji bona ku ew wan tiştan nas û fahm nake û nizane çawan bi wan re bide û bistîne. Ji bona ku der û dora xwe nas nake û fahm nake, her carê belayek tê serê wî.

Bêşik pêwîst e ji yana her tevgerêke siyasî ne wek ji yana zarokekê ye. Wek ji yana zarok ji dest pê nake û pêş nakeve. Tiştên ku ji her tevgerêke siyasî tê xwestin ji diroka derbasbûyî de ji xwe re tecrûbe ji derxîne û tûşî bela û astengan neyê. Lê mixabin dema mirov der û dora xwe dinêre, mirov dibîne ku qey qedera her tevgerêke siyasî ye, nikarin xwe ji xeletî û şaşiyên bidin alîkî. Wek mîsal dema mirov ji yana tevgera gelê Filîstîniyê dinêre, mirov dibîne ku tevgerêke herî pir di ji yana xwe de xeletî û şaşî kirîye yek ji ew e.

Bêşik biryara Netewên Yekbûyî (NY) ya 1947'an a ku naskirina dewleteke Îsraîl û Filîstîniyê ne biryareke adil bû, çûnî axa ku îro Erebia Cuhû li ser dijîn % 54,4 li ber para Cuhûyan û %42,9 li ber para Erebian ketibû. Qudûs û Beytullahim ji di bin seytara hêzên navnetewî de man. Gaza ji bo Misirê û Rojavaya Şeria ji bo Urdunê mabû. Erebia Filîstîniyê bêtî ku rewşa cihanê a di wê wextê de bidin ber çavên xwe, ew biryara NY qebûl nekirin, dest bi şer kirin. Çûnî Enterîtiya Erebian careka din serî hildabû.

Ji 1948 heta 68'ê di navbera van 20 salan de dewleta Îsraîlî axa Filîstîniyê hemû xist bin kontrola xwe û di ser re ji Girê Golanê û ji perçekî axa Misirê jî xist bin destê xwe. Vêca îro piştî 20 salan ve aşitiya ku rû daye doza axa ku berê 20 salan dest ve berdayî dibe. Wexta mirov bi aqlekî selîm li diroka herdû gelan dinêre mirov difikire ma gelo ew şer, ew qetlîam, ew xwîna hate rijandin me qey qedera wan bû. Bêşik ne hewce ye ku mirov bîne ziman ku yê êrîşker û dagirker û esas sebebê vê trajediyê dewleta Îsraîl bû. Lê heger gelê Filîstîniyê û Erebian bi Enterî li meselê nenêrbûna dê ewqas kuştin û koçkirin û qetlîam belkî di

diroka herdû gelan de rû nedana.

Yaser Arafat piştî Enterî û xeletiyên 40 salî di jiyana siyasî de ji şehîd Qasimlo re digot; "Heger aqilê min yê îro di 1967'an de di serê min de bûye, nuha me mesela gelê xwe zû ve çareser kiribû". Arafat aqilê xwe yê berî 20 salî bi rojnamavana Îtalî O. Falacî re di hevpeyvîneke de tîne zimên. Digot, " emê Cuhûya ji ve axê biqewrînin û dewleta wan ji ji ortê rakin, ancax dê wê gavê aşî bê herêmê, xeynî ve em nikarin bahsa aşitiyê bikin.

Aqilê ku piştî 20 salan ku hatiye serê Arafat ji ji mecbûriyê bû, çûnî Arafat bi alîkariya 20 dewletên Erebian, û ewqas dewletên misilman û bi alîkariya dewletên sosyalist nikaribû dewleta Îsraîlê ji ortê rake. Îcar mecbûr bû ku bi Îsraîl re bide û bistîne, ji bo ku axa berî 20 salan bi xeletiyên siyasî dest Îsraîlê ve ber-

dabûn, paşte bistînin, ji destpêkê dest pê kirin. Heta mirov dikare bêje Arafat li van salên dawiyê ji bo ku rê li pêşiya Îsraîlê bigre di siyaseta û dîplomasiyê de, çalekiyek û serketineke pirr bilind ji nişan da. Ji bona ku rê li Îsraîliyan bigre li dijî her pêşniyariyêke Îsraîliya bi pêşniyariyêke hîn maqûltir û hîn ber bi aqiltir bi rê ket. Îsraîliyan berî çend salan digotin ku em bi PLO re rûnanin û ew rêxistineke terorîst e. Lê Arafatî ne got divê dan û sitandin îlahî bi PLO re be. Ewî digot "hûn dikarin bi Filîstîniyan re rûnin, bila Filîstîniyên ku di axa dagirkirî de dijîn bin, yan jî bi serokên belediyan ku Filîstîniyê re dikarin rûnin. Yanî got bila Filîstîniyê bin kî dibe bila bibe.

Piştî vê dîplomasiya serketî Îsraîlî mecbûrê guftûgoyê bûn. Îro jî aşitiya di navbera herdû gelan de rû daye, pêvajoyekê dirokî ye. Gelê Filîstîniyê di van 20 salên dawiyê de bin seroktiya Arafatî de di riyeke pirr dirêj û zahmet re derbas bû, dawiyê evê riya zahmet Arafat hetanî xelata Aşitiyê a Nobelê jî bir. Diroka gelê Filîstîniyê bi siyaseta û taktîkên xwe tecrûbeyeke mezin e ji bo çareserkirina pirs û pirsagirêkên gelên herêmê û her wisa ji bo pirsê gelê Kurd jî.

Lê mixabin wilo diyar e ku em Kurd, emê weha zû bi zû nekarin xwe ji Enteriyên xwe xelas bikin...

\* Bi Erebia Enterî mahna "Don Kîşotiyê" ye.

# BEROŞ



Mahmûd Lewendî

## PIÇEKÎ JÎ JI HEV DERXISTINOK Û TÊDERXISTINOK

Ferqa di navbera kuçik û kêç de çi ye?

-Kêç dikeve laşê kuçikî, lê kuçik nakeve laşê kêçê!

Çavên wî baş nediditîn, her çendî doktor berçavîkek dayê jî, lê dîsa jî nikaribû bixwenda, çima?

-Çimkî xwendin û nivîsandina wî tune ye!

Marê ku xwaro-marî diçe, wexta ku dets pê bike rast biçe, tê çi maneyê?

-Mar serxweş e!

Ger şofêr destê xwe yê çepê di pencera ereba xwe re derxistibe, tê çi maneyê?

-Dêmax pencera wî ya çepê vekirî ye!

Ferqa di navbera doktor û abûqat de çi ye?

-Doktor pêşî te tazî dibe, paşê guhdariya te dibe. Abûqat pêşî guhdarî dibe, paşê te tazî dibe!

Ger te bi kar anî tijî ye, ger te bi kar neanî vala ye!

-Sol

Meriv kîjan macûnê di camê nade?

-Lahmêcûn!


Kaxetê ji qelemê re çi gotiye? -Li ser min pir negere xurikiya min tê!

Sê fil li dû hev diçin. Filê yekem dibêje "filê duwem li paş min e"

Filê duwem dibêje "filê sêyem li paş min e".

Filê sêyem dibêje "filê yekem li paş min e". Ev çawa dibe?

-Filê sêyem derewan dibe!



### GER TU BIXWAZÎ

Du reşikên Afrîkî li gel pitikeke du-sê mehî ya di ereba dergûşê de ji xwe re li ber dikanekê sekinîbûn. Keçeke Swêdî ya ciwan û xweşik hat nêzî wan û li bebikê nihêrî û got:

-Çi bebikeke xweşik û şîrin e!

Ji reşikan yekî got:

-Ger tu bixwazî, em dikarin yekê çêkin!

### Ji bo porê ziwa ye

-Kuro tu çi dikî?

-Porê xwe dişom.

-Ma welê dibe, divê ku tu pêşî avê li serê xwe kî, paşê şampûanê te bidî.

-Na lo, pêwîst nake, ji ber ku ev şampûan ji bo porê ziwa ye!

### NÎVÊ 8'Ê SIFIR E

Mamoste ji telebê xwe re dibêje:

-Çawa dibe kurê min, ma nivê 8'ê dibe sifir?

-Belê mamoste, ger tu di nivî de bikî bi du cî!


### ADEM Û HEWWA

Rojeka buharê ya xweş, Adem û Hewwa ji xwe re li buhuştê digerin. Hewwa ji Adem dipirse:

-Adem, tu ji min hez dikî, ne?

Adem:

-Ma bêyî te kî heye ku!



### Ji bo kevrosêkê...

Nêçîrvanek ji yekî din re dibêje:

-Par ez çûm nêçîra kevroskan, min tam 999 kevrosk kuştin.

Yê din:

-Ma hema bêje hezar! Nêçîrvan: -Na welle babo, ez nikarim ji bo kevrosêkê derewan bikim!



## ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Sinneta ku îro tê kirin ji B. Z. î 2300 li Misrê dest pê kiriye. Li gor antropologan sebeba sinnetê ne paqîjî lê tiştêkî din e. sinnetkirin ji Misrê derbasî Îsraîlê bûye û ji bil cûhiyan, misilman û êzdiyan jî ve adetê bi cih anîne.

Li dinê çola herî mezin çola sahra ya li bakûra Afrîkayê ye. Dirêjahiya wê ji rojhilata heta rojavayê 5150 km, ji bakûr heya

başûrê 2250 km ye. Firehiya (aqara) çola Sahrayê 9269000 km<sup>2</sup> û bilindiya wê ji behrê li herêma Qattara li Misrê 132 m û li herêma çiyayê Emî Kousî li Çadê 3415 m ye.

Dirêjahiya birûskekê ji 90 m heya 6 km tê guhertin lê carna di rewşên taybetî de dirêjahiya birûska digihêje 32 km jî. Sureta (pîti, beş, lessîni) birûskekê di dema teqandinê de ji 160 km/s heya 1600 km/s tê guhertinê.

Li herêma Tutunendo li Colombiyayê di salekê de 11770 mm baran dibare.

Li herêma Kauai li der û dora çiyayê wailalale (ji behrê 1569 m. bilind e) di salekê de 350 roj baran dibare.